Azadiya
WELAT
Rojnameya Hefteyî
68
SAL: 2
18 - 24 Gulan 1997
BUHA: 75.000 TL



Bi sam-7'an çar helîkopter hatin xistin

Li ser dagirkirina artêşa tirk a Başûrê Kurdistanê lêpirsîn:

Artêşa tirk ji Başûr derkeve!

Rûpel 8-9

Amed Tîgrîs:

Pîvanên kurdî û kurdayetiyê çi ne?

Rûpel 7

Mahmut Kılınç:

Gelê Kurd dîsa dibe qurbanî

Rûpel 7

www.arsivakurd.org

NAVEROK



6

Zülküf Kışanak: Şehîdê Sêwreg Deza
Ali İhsan Üçkardeş

10

Bavê Şilêr: Çîrokên Helîm Yûsiv
Mirî Ranazin

11

Azadiya Welat/ Laziqiye:
Li Başûrê Biçûk du çalakiyên toreyî

Ji Xwendevanan

MIN nivîsa heval Roşan Lezgîn ku bi navê "Bangek ji xwendevanan re" xwend û ez pir kêfxweş bûm. Hûnê bên çima?
Çimkî, wî berê qet bi kurdî nizanibûye, lê belê bi derketina Welat dest bi zimanê kurdî kiriye û hîn bûye. Ez wî û ewên mîna wî, her wiha jî ez xebatkarên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat pîroz dikim.

Ez jî yekî mîna Roşan Lezgîn, ji 'Welat' hînî xwendin û nivîsandina bi kurdî bûm, ez bawer im, gelek mirov jî wekî me hînî kurdî bûne. Ji bo vê yekê roleke mezin dikeve ser Azadiya Welat.
Wezîfeke mezin jî dikeve ser milên xwendevanan ku ew jî Azadiya Welat bixwînin û bidin xwendin.
Nebêje ez çawa, li ku derê hîn bibim? Qemçika masî di destê te de ye. Eger ku ew bifilite, êdî tu nikarî biqefilî. Ji bo vê yekê qemçika masî baş bigire.

FEDLÎ ZEMAN/AMED

***ROJANEMEYA** Azadiya Welat, em gelekî diecibînin. Gava em wê di nav rojnameyên din de dibînin, dilê meyî çerpisî, ev qasî vedibe û carekê dî tirh didê, wekî tirhikê beharê. Em wê distînin û wê dixwînin.*

Lê her tim ez di rûpelên wê de şeklê bi hezaran egîdên şehîd dibînin. Em dizanin ku ev bi xwîna wan şehîdan îro digihê destê me. Bi vê manê, li ber şehîdê nemir em careke dî bejna xwe ditewînin. Em dixwazin ku îmkan hebe, hûn xaçepirsa xwe mezintir bikin, wekî yek an du rûpel.

HAKKI UÇAR/BATMAN

Di netewebûnê de girîngiya hest, ramanan

SAMÎ TAN

Kesên ji neteweyekê, digel yekbûna ziman, çand û welatê xwe, bi hest û ramanên xwe jî ji neteweyên din vediqetin. Gelên ku ji heman neteweyê ne li hemberî bûyerên dîrokî jî xwedî heman hest û helwestê ne.

Qelemşorên tirk îdia dikin ku kurd û tirk wekî goşt û hestî ne, bi heman çavî li bûyerên dîrokî dinêrin. Em bûyerên dîrokî deynin aliyekî, êdî rojeva me jî ne yek e. Berê jî li ser gelek bûyeran em ne xwediyê heman hest û ramanan bûn, lê ne qet nebe jî ber nezaniya me be jî, dema şerên Kıbrıs û Koreyê dihatin rojevê, hest û ramanên me nêzî yên tirkan bûn. Îro em li ser van bûyeran jî xwediyê hest û ramanên cuda ne, em bi çavê rayedarên tirk li bûyera Kıbrıs û Koreyê jî nanêrin.

Digel vê yekê, îro rojeva me jî yekcar ji rojeva tirkan cudatir e. Ev yek, asta netewebûna me jî nîşan dide. Piştî destpê, kirina şerê azadiyê roj bi roj hest û ramanên me ber bi xweseriyê ve çûn, em bi ser xwe ve hatin. Hin raman û rêxistinên ku ji bo dewleta tirk xeternak bûn, ji bo me bûn pîroz.

Binêrin, îro dêhn û bala hemû kurdên azadîxwaz li kîjan welatî û cihî dibin ew zanin, li ser şer, bi taybetî jî li ser şerê Başûr e. Piraniya kurdan roj bi roj nûçeyên MED-TV'yê dişopînin, li hemberî kirinên hêzên tirk û îxanetkaran hêrs dibin, li hemberî serkeftinên tevgera kurd kêfxweş û serbilind dibin. Li aliyê din tirk, qet bala xwe nadin van bûyeran, gava zarokên wan tên kuştin, bi piranî bêdeng, di ber xwe de dikizkizin. Îro her kurdê ku piçek welatparêzî pê re hebe, ji bo ku leşkeriya tirkan neke, çi ji wan tê, dikin. Li aliyê din tirkên ku xwe wekî şoreşger bi nav dikin jî, berê xwe didin nav refên mihemedokan.

Tê zanîn ku dozek pêşî di mêjiyê mirovan de bi ser dikeve. Dema gelek, bi piranî gihîşt bîr û baweriyekê, êdî têkçûna wê bîr û baweriyê ne gengaz e. Doza neteweyî êdî di serê piraniya kurdan de cihê xwe girtiye, lê hê piraniya kurdan negihîştine wê zanînê ku li gorî hewcedariyên wan bîr û baweriyan tevbigerin.

Li aliyê din ziman û têgînên ku em bi kar tînin jî divê xweserî me bin. Dema em dibêjin 'welat', divê her çar parçeyên welêt werin bîra me, ne ku êrdima ku tirk jê re dibêjin "Dayê tijî (Anadolu)." Xuyaye ku dema Başûr hate gotin, tiştên cuda tên bîra me û tirkan, li gorî wan, Başûr kêraxa Behra Spî ye, li gorî me başûrê Kurdistanê ye, heman tişt ji bo Rojhilat û Bakur jî wisa ye.

Bi dîtina me divê em di vî warî de xwediyê dîtineke zelal û diyar bin. Her çiqas şûrkêşên îdeolojiya fermî ji bo ku lîteratûra me biguherînin bi ser me de werin jî, divê em bi şûn ve gav neavêjin. Dibe ku hinek rêxistin û partiyên ku li ser navê Kurdistanê siyasetê dikin, parçeyekî welat wekî "bakurê Iraqê" bidin nasîn, lê çênabe ku em jî rabin bi zimanê dagirker û împeryalîstan bipeyivin. Em dibînin ku hinek partiyên ku xwe wekî çepgir û şoreşger didin zanîn jî, parçeyekî welatê me ku dewleta Iraqê bi xwe jî wekî Kurdistan bi nav dike, mîna "bakurê Iraqê" bilêv dikin.

Li aliyê din em ji hinek siyasetvanên kurd jî hêvî dikin ku hurmetê nîşanî hestên neteweyî yên gelê kurd bidin û parçeyekî welatê wan wekî "Başûrê Rojhilat" ê din jî wekî "bakurê Iraqê" bi nav nekin.

Xanedana Barzaniyan

HESEN ZINAR

Li vî welatî maneya gelek tiştan hate guhartin. Tevgera azadiyê wekî barana adarê, xweşikahiya gelek tiştan derdixe holê, gelek qirêjiyan jî bi lehiyê re dibe, diavêje binê bahrê

Heyama berê, ku navê "Berzanî" dihate bihîstin, di dilê mirov de germbûnek çêdibû. Ev nav bi mirov şêrîn bû. Xweş dihate guhê mirov. Li gelek herêmên welêt, wêneyê Mele Mistefa bi dîwarê odeya mêvanan ve daleqandî bû. Der heqê lehengî û mêrxasiya Mele Mistefa û pêşmergeyên wî de gelek çîrok, bûyer û efsane dihatin gotin. Ev nav wekî navekî serokê olê pîroz û hêja bû. Her kesî dizanî bû, çend jinên Mele hene û xwedî çend zarokan e. Navê zarokan jî di bîra her kesî de bû.

Gelek camêran, dev ji zar û zêçên xwe berdidan, bi salan suxre ji êla Berzanî re dikirin. Pir kesên ku ji ber hin sedeman li Bakur firar diman, di nav refên pêşmergeyan de cih digirtin. Dema ku efû derdiket, vedigeriyan mala xwe.

Bazirganên ku ji Licê, Çewlik û Omeriyan qesta Başûr dikirin, ne hindik çek, kinc, derman, tutin û hwd. ji pêşmergeyan re dibirin.

Mele Mistefa çû ser heqiyê, Mesût melik bû, hate şûna bavê xwe. Di dema wî de jî elaqeya welatparêzan ji binî ve jê nehate birîn. Di fermana 1988'an de gelê me yê Başûr û pêşmergeyan xwe li Bakur girtin. Welatparêzên Amedê, Nisêbînê, Cizîrê, Mûşê, Çêlê û Silopiyê û deverên din bi traktoran, bi kamyonan hûremûr û xwarin dane hev ji wan re. Ev wezîfe bû. Minet jî tê de tune bû. Tevgera Azadiyê, welatparêziyeke şoreşgerî xistibû nava gel. Li ber çavên gelê me welat ne bi tenê Bakur e. Rojhilat jî û her du başûr jî perçeyên welêt in.

Vê malbatê, malbata Berzaniyan çi zanîn kiriye serê gelê Başûr ango êla xwe. Ew pêşmergeyên ku di biçûkahiya xwe de efsane bûn û diketin xewna me, niha kincê leşkerên tirkan li xwe dikin û dibêjin: "Bijî Tirkiye, bimre partiya karker..." Helal ji wan re, qey mêr di ser wan re hene!...

Îro tu ji kîjan welatparêzên ji 70 salî mezintir dipirsî, li kaba xwe dixin. Dibêjin xwelî li me be ku me dilxwazî û piştgiriya malbata Berzan kiriye.

Vê malbatê çi daye gelê xwe? Dewlet daye, rûmet, zanîna berxwedanê ya welatparêziyê daye, çi daye? Rev, xizantî, lavekirin, lomekerin, baweriya bi gel û dewletên biyan daye. Mirovên ku di bin bandora tevgera azadiyê de mane û hînî zanîna rûmeta mirovatiyê, serbilindiyê, dijbertiya koletiyê, camêrî û mêrxasiyê bûne, çawa nabêjin: "Heyf û xebînet ji wê ked û xwêdana me ya ku bi avê de çûye de."

Gelê kurd, morîka xewê ji guhê xwe avêt. Ji xewa giran hişyar bûye. Van qijnikan, van tiralên Bexdayê hew dipejirîne. Bila ev mîrek û 'Begler' herin li pey birinc (riz) û meqerneya xwe bigerin... Ev ne serokatiya me, welatiyê jî heq nakin.

Li vî welatî maneya gelek tiştan hate guhartin. Tevgera azadiyê wekî barana adarê, xweşikahiya gelek tiştan derdixe holê, gelek qirêjiyan jî bi lehiyê re dibe, diavêje binê bahrê... Zimanê min nagere ku bibêjim, Seydayekî hetfê û çar salî wiha digot: "Birazî nebêje 'pêşmerge', bêje 'qeşmerge.' Bila pêşmergeyên ku ji can û dil ji bo welatekî serbixwe û yekbûyî tê dikoşin me bibexşînin..

Îro li civatên gund û bajaran, li metrepol û Ewrûpa, kurdistanî navê Berzaniyan wekî xwefiroşî, nokeriyê dibînin. Mîrektî û xanedaniya malbata Berzaniyan heta bi vir bû. Ev fîlm li vir qediya.

ROJA 22'yê gulanê, serê sibehê li avahiya DGM'ya Amedê, sekreterê İHD'ya Amedê Av. Sinan Tanrıkulu, piştre jî Serokê İHD'ya Amedê Av. Mahmut Şakar ji hêla polîsan ve hatin binçavkirin. Hêzên dewletê, saet li 12.20'an jî avêtin ser avahiya İHD'ya Amedê û bi mebesta lêgerînа Komeleyê, dest danîne ser kovar û pirtûkên di arşîv de û rapor û faksên ku der barê îhlalên mafên mirovan de. Di vê navberê de, ji rêveberên Komeleyê Pirazhan Doğrul, Özlem Çetin û Vedat Çetin, ji hêla polîsan ve hatin binçavkirin. Her wiha li gorî agahiyên ku ketine destê me endamê MYK'ya İHD'ê Nebahat Akkoç jî, ji aliyê polîsan ve ji mala wê hatiye binçavkirin. EĞİTİM-SEN'a Amedê jî bûye hedefa hezên dewletê û Serokê Şaxê Haydar Kılıçoğlu jî hatiye binçavkirin.

LI hemberî dagirkirina başûrê Kurdistanê, xwendekarên kurd, roja 20'ê gulanê, li Fakulteya Cerahpaşa ya Tıp'ê ya Stenbolê 200 xwendevanên welatparêz ên YCK'yî li dora saet 12:30'an ji bo protestokirina dagirkirina Başûr û hevkariya hêzên tirk û PDK'ê kom bûn û ev dagirkirin bi girseyî protesto kirin. Di vê livbaziyê de molotof hatin avêtin û lastîk hatin şewitandin û dirûşmeyên wekî "Bijî Serok Apo", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok", "Wê Kurdistan jî faşîzmê re bibe goristan" û "Sala me ya fînalê ye, riya me Kurdistan e" hatin avêtin û belavokek hate belavkirin. Xwendevanên YCK'yî piştî xwendina şiîran û dîlangirtinê berî ku polîs werin, belav bûn.

NÛÇE

Bi sam-7'an çar helîkopter hatin xistin

Li gorî daxuyaniyên ARGK'ê heta vê rojê 23 gerîla di şer de giyan dane û 9 gerîla jî birîndar bûne. Li gorî daxuyaniyê, gerîla bi xwe çûne ser cendekê 25 leşker û 28 PDK'yiyan û çekên wan hildane. Ji daxuyaniyê diyar dibe ku heta niha bi fûzeyên sam–7 yek super kobra, 4 helîkopter ketine.



Li başûrê Kurdistanê tevgera dagirkirinê ya artêşa tirk û berhingariya gerîlayên ARGK'ê didome. Ev tevgera dagirkirinê, bi xwe re êrîşên li dijî kes û saziyên sivîl jî tîne. Di van êrîşan de gelek mirovên sivîl hatin kuştin. Li gorî agahiyan leşkerên tirk, digel pêşmergeyên PDK û tirkmenan roja 17'ê gulanê serê sibê li Hewlêrê avêtin ser hinek saziyên wekî NÇM, rojnameyên Welat û Welatê Rojê û nexweşxaneyeke Heyva Sor a Kurdistanê, gelek kes girtin û gulebaran kirin. Li aliyê din heman hêzan avêtin ser malên alîgirên PKK, YNK, Partiya Sosyalîst, Partiya Zehmetkêşan, YNDK, Partiya Muhafazakaran. Li malên wan jî gelek kes hatin girtin û kuştin.

Digel reaksiyona rêxistinên Kurdistanî, reaksiyona gelek welatan jî zêde dibe. Welatên wekî Iraq, Îran û Sûriye hêzên xwe yên leşkerî li ser sînor dicivînin. Tê gotin ku Sûriyeyê li sînor dest bi tatbîqatekê kiriye. Dîsa bi taybetî welatên ereb, Rûsya û hinek welatên ewrûpî, dagirkeriya artêşa tirk şermezar kirin. Her wiha gotinên Serokê Lîbyayê Muammer Qadafî yên şêweyê "Kes nikare rê li ber pêkhatina Kurdistaneke serbixwe bigire", şayanî bahsê ne. Digel van yekan jî tê gotin ku wê artêşa tirk heta meha gelawêjê li Başûr bimîne.

Li ser şer, çapemeniya tirk tenê daxuyaniyên Serkaniya Giştî diweşîne, ku tê de agahiyên nepixandî hene. Li gorî van agahiyan heta niha li dora 1500 gerîlayî hatine kuştin. Lê çapemeniya navneteweyî jî baweriya xwe bi wan gotinan nayine, lewre jî van hejmaran di nava neynûkê de dide, li nik wê jî agahiyên ku ji MED–TV girtine dide.

Di roja nehemîn a şer de Biryargeha Navendî ya ARGK'ê daxuyaniyek li ser xesara di şer de da. Li gorî vê daxuyaniyê, heta vê rojê 23 gerîla di şer de giyan dane û 9 gerîla jî birîndar bûne. Dîsa tê daxuyandin ku hejmara pêşmergeyên PDK'yî yên ku hatine kuştin 170 ye. Li gorî daxuyaniyê, gerîla bi xwe çûne ser cendekê 25 leşker û 28 PDK'yiyan û çekên wan hildane. Ji daxuyaniyê diyar dibe ku heta niha bi fûzeyên sam–7 yek super kobra, 4 helîkopter ji aliyê gerîla ve hatine xistin.

Li gorî agahiyên ku bi dest me ketine, li Başûr û Bakur di şer de zaîyatên ku çêbûne û çalakiyên ku pêk hatine ev in:

Roja 15'ê gulanê li nêzî gundê Rastayê yê di navbera Sason û Pasûrê de leşkerên ku derketibûn operasyonê ketin kemîne gerîla, di şer de 4 leşker bi xedarî birîndar bûn û tê gotin ku ew rakirine Nexweşxaneya Leşkerî ya Amedê.

Di roja 5'an a tevgera dagirkirinê de şerê di navbera gerîla û hêzên dewleta tirk de bi giranî li Zap, Metîna, Haftanîn û Sînahtê, şerê gerîla û PDK'ê jî li derdora bajarokê Begovayê diqewimin. Tê gotin ku 2 îtîrafkar, 8 pêşmerge û 20 leşkerên birîndar anîne nexweşxaneya seyar a li Silopiyê. Li herêma Zap û Metîna yekîneyên artêşa tirk ketin kemîna gerîla, di şer de digel assubayê Bartınî Hasan Aydın û leşkerê jî Beypazariya Enqereyê Yılmaz Tanrısever, gelek leşker hatine kuştin.

Li herêma Sersingê di 17'ê mehê de 12 leşker û pêşmergeyan pêlî mayînên ku gerîla naştibûn, kirine û can dane. Li aliyê din helîkoptereke artêşa tirk ji aliyê gerîla ve hate xistin. Li gorî agahiyan piştî ku helîkopterê derbe xwariye, li nêzî Deştana Çêlê ketiye.

Roja 18'ê gulanê şer bi giranî li derdora Derkar, Sersing, Begova, Sînaht, Bamernî pêk hatine. Di şer de tê gotin ku 5 PDK'yî hatine kuştin. Di navbera gerîla û hêzên dewletê yên ku ji Tabûra Gülyazıya Qilaban de beşdarî tevgerê bûbûn de, li navbera Sînaht û Bamernî de şer derketiye, di şer de 3 cerdevan hatine kuştin. Di şerên li derdora Sersing û bajarokê Begovayê de jî 2 leşker, 3 cerdevan û gerîlayek hatin kuştin, 4 leşker û cerdevanek jî birîndar bûne.

Çalakiyên gerîla yên li Bakur jî zêde dibin, gerîlayên ARGK'ê şeva 18'ê gulanê avêtin ser navçeya Dêrikê. Gerîla avahiyên hêzên dewletê dan ber roketan û piştî wê bi qasî nîv saetê şer derket. Hêzên ARGK'ê li navçeyê belavok belav kirin û dan zanîn ku wan ji bo tolhildana dagirkirina başûrê Kurdistanê ev çalakî pêk anîne.

Di heman rojê de hêzên gerîla riya di navbera Mêrdîn û Şirnexê de jî birîn û bi qasî 100 kamyonî dan rawestandin û propaganda kirin. Li wir gerîla sê erebe şewitandin. Roja 17'ê gulanê li sêgoşeya Lice, Gênc û Palûyê şer derket, di şer de leşkerek hate kuştin, 3 leşker jî birîndar bûn. Li Bewaşa bi ser Misircê ve, şer derket, tê gotin ku di şer de 2 gerîla hatine kuştin. Çavkaniyên herêmî didin zanîn ku di vê bûyerê de gelek leşker birîndar bûne.

Roja 18'ê gulanê di şerê Xakurkê de ku di navbera PDK'ê û hêzên gerîla de derketiye, ji ber ku PDK gelek zayiyat daye, leşkerên tirk çûne hawara wan. Li gorî agahiyên çavkaniyên herêmî di şer de 200 pêşmergeyên PDK'ê hatine kuştin.

Li Kanîreşa Çewlikê gerîla konvoyeke leşkerî xistin kemîna xwe, di vê êrîşa gerîla de 3 leşker hatin kuştin û 4 leşker jî birîndar bûn.

Dîsa di tevgera hêzên dewletê ya ku piştî cerda gerîla ya li ser Dêrikê dest pê kir de, tê diyarkirin ku di navbera gerîla û hêzên dewletê de şer derketiye û di vî şerî de 4 leşker û cerdevanekî bi navê Mustafa Bağmaz hatine kuştin.

Roja 18'ê gulanê di navbera Pasûr û Farqînê de gerîlayan bi çekên giran êrîşî ser yekîneyeke leşkerî ku derketibû keşîfê kirin, di şer de 2 leşker mirin û 5 leşker jî birîndar bûn.

Roja 20'ê gulanê, gerîla avêtin ser niqteyê kontrolê ya li ser riya Wan û Tatwanê ya polîsan. Li gorî nûçeyeke NTV'yê 7 polîs di vê bûyerê de mirine. Dîsa êvara 18'ê gulanê gerîla êrîş birin ser sê tanqên neftê yên li taxa Petrolê ya Semsûrê. Agir bi tanqan ket, agir ji aliyê îtfayê ve hat vemirandin.

Li Şemzînan gerîla êrîş birin ser mewziyên leşker û cerdevanan, li wir çawîşekî pispor û du cerdevan hatin kuştin. Helîkoptera ku ji Tabûra Sersêvê radibû, ji hêla gerîla ve hate derbekirin, agir pê ket. Agirê ku bi helîkopterê ket ji hêla îtfayeya Çêlê ve hate vemirandin, lê tê gotin ku helîkopter bi giranî hatiye rûxandin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Derheqê kirmanckî (kirdkî) de kombiyayîşê II ê Stockholmî

28-31 ê adare 1997

Roja 28'ê aşma (menga) adare de, Stockholm de, kirmanckî (kirdkî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayîşê diyine dest pêkerd û çar rojî (28-31ê adare) ramit. Nê kombiyayîşê diyine de nê heştês kesî amade biy:

Osman Aytar (Sêwregi)
Yildiray Beyazgül (Gimgim)
Çeko (Gimgim)
Mûnzûr Çem (Dêrsim)
Hûmanê Çiyan (Depe)
Haydar Diljen (Sêwregi)
Nîhat Elî (Sêwregi)
J. Espar (Pîran)
Cemîl Gündoğan (Dêrsim)
Lerzan Jandîl (Gimgim)
Huseyîn Kulu (Dêrsim)
Seyîdxan Kurij (Çewlîg)
M. Malmîsanij (Pîran)
Selîm Mûrat (Pali)
Robîn Rewşen (Lîce)
Kamer Söylemez (Dêrsim)
Harun Turgut (Pali)
Şukrî Urgun (Hêni)

Nê kombiyayîşî de amedebiyayoxî, nê meselanê cêrînan ser o vindertî, munaqeşe kerd û meylê xo tesbît kerdî:

I-Name
1)Nameyê lehçeya ma
2)Nameyê hetan (cîhetan)
3)Nameyê mengan (aşman)
4)Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî
II-Zemîr
Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)
III-Sifet
Rengî

IV-Hûmarî

Şima nê nuştî de netîceyanê nê munaqeşeyan û meylan wanenê. Netîceyê ke, ze meyl tesbît bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan îfade kenê. Nê, ze tewsîye û teklîfî yê.

Tanî çeku (kelîme) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mintaqayan de ciya yê.

I-Name

1)Nameyê lehçeya ma

Kurdê ke bi lehçeya ma qisey kenê ca ra ca xo ra vanê "kirmanc", "kird", "zaza" yan zî "dimili"/"dimlî"; lehçeya xo ra vanê "kirmanckî", "kirdkî", "zazakî" yanzî "dimilkî"/"dimilî"/"dimlî".

Meylê kombiyayîşî nê çekuyan (kelîmeyan) ra "kirmanc" û "kirmanckî" ser o yo.

2)Nameyê hetan (cîhetan)

kirmanckî (kirdkî)	tirkî
rojawan	batı
.rojhelat	doğu
vakur	kuzey
başûr	güney
vakurê rojhelatî	kuzeydoğu
vakurê rojawanî	kuzeybatı
başûrê rojhelatî	güneydoğu
başûrê rojawanî	güneybatı

3) Nameyê mengan (aşman)

Kirmanckî (kirdkî) de him çekuya "mengi" him zî "aşme"/aşmi"/aşm" vajiyêna. Tani cayan de "mengi" yena mena "mois" a ziwanê frenskî (30 roj), "aşme" yena mena "lune" a frenskî (bi tirkî "gökteki ay"). Tanî cayan de zî çekuya "mengi" nêvajiyêna, "aşme" him mena "mois" him zî "lune" a ziwanê frenskî dana.

kirmanckî (kirdkî)	tirkî
1. çele	1. ocak
2. sibate, gucige	2. şubat
3. adare	3. mart
4. nîsane	4. nisan
5. gulane	5. mayıs
6. hezîrane	6. haziran
7. temmuze	7. temmuz
8. tebaxe	8. ağustos
9. êlule	9. eylül
10.oktobre	10. ekim
11. teşrîne	11. kasım
12. kanûne	12. aralık

Nê nameyan ra "çele" nerî (masculin) yo, nameyê bînî makî (féminin) yê. Nameyê mengan bi herfa hurdî (wurdî) dest pêkenê.

4)Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

Goreyê îdareyê dewletan tanî naeyê cayan nê yê:

kirmanckî (kirdkî)	tirkî
dewe	köy
nahiye	nahiye
qeza	ilçe, kaza
şaristan, bajar	il, vilayet; şehîr, kent

Meylê kombiyayîşî nê panc çekuyanê corînan ser o yo, labelê formê bînî zî estê. Nimûne:

meylê kombiyayîşî	formê bînî
dewe	dewi, dew
şaristan	şahrestan, şeher, şehîr

sûke: Tanî cayan de çekuya "sûke"/"suki"/sûk" menayanê "şehir, kent, il merkezi", "ilçe merkezi" yan zî "çarşı" yê tirkî de vajiyêna. Ma vajî Diyarbekir, Erzingan û Sêwregi ra "sûke" yan zî "suki" vajiyêno. Ziwanê erebkî de "sûq" mena çarşu"y de ya û tanî nuştoxî vanê ke eslê na çekuye ziwanê berberkî ra ameyo.

Şaristan û qezayê Kurdistanî

Ma nê kombiyayîşî de nameyanê tanî şaristanan û qezayan ser o vindertî. Tiya de ma derheqê nê nameyan de meylê kombiyayîşî nusenê. Ma wext nêdî ke nameyanê şaristanan û qezayanê bînan ê Kurdistanî ser o vinderê.

nameyo kirmanckî	nameyo ke dewlete panawo
1)Bidlîs	1)Bitlis
1. Elcewaz	1. Adilcevaz
2. Hîzan	2. Hizan
3. Motkî	3. Mutki
4. Tûx	4. Tatvan
5. Xelat	5. Ahlat
2)Çewlîg	2)Bingöl
1. Azarpêrt	1. Adaklı
2. Bongilan	2. Solhan
3. Çêrme	3. Yedisu
4. Dara Hênî	4. Genç
5. Gêxî	5. Kiği
6. Kanîreş	6. Karlıova
7. Xorxol	7. Yayladere
3)Dêrsim, Mamekiye	3)Tunceli
1. Çemişgezek	1. Çemişgezek
2. Mazgêrd	2. Mazgirt
3. Pêrtage	3. Pertek
4. Pilemuriye	4. Pülümür
5. Pulur	5. Ovacık
6. Qisle	6. Nazimiye
7. Xozat	7. Hozat

Dêrsim eslê xo de nameyê yew mintiqa yo. Nameyê şaristanî bi xo Mamekiye ya, ci ra Kalan zî vajiyêno.

4)Diyarbekir	4)Diyarbakır
1. Bismil	1. Bismil
2. Çêrmûg	2. Çermik
3. Çinar	3. Çınar
4. Erxenî	4. Ergani
5. Gêl	5. Eğil
6. Hezro	6. Hazro
7. Hêni	7. Hani
8. Karaz	8. Kocaköy
9. Licê	9. Lice
10. Pasûr	10. Kulp
11. Pîran	11. Dicle
12. Silîvan	12. Silvan
13. Şankuş	13. Çüngüş
5)Erzingan	5)Erzincan
1. Ciminî	1. Üzümlü
2. Îlîç	2. İliç
3. Kemaliye	3. Kemaliye
4. Kemax	4. Kemah
5. Mose	5. Çayırlı
6. Refahiye	6. Refahiye
7. Têrcan	7. Tercan
6)Erzirom	6)Erzurum
1. Aşqele	1. Aşkale
2. Çat	2. Çat
3. Gogsî	3. Karayazı
4. Hesenqele	4. Pasinler
5. Îspîr	5. İspir
6. Narman	6. Narman
7. Oltî	7. Oltu
8. Olur	8. Olur
9. Ortîlî	9. Şenkaya
10. Tatos	10. Tekman
11. Xinûs, Kela	11. Hınıs
12. Xoresan	12. Horasan
7)Mûş	7)Muş
1. Gimgim	1. Varto
2. Kop	2. Bulanık
3. Milazgir	3. Malazgirt
8)Riha	8)Urfa
1. Bêrecûg	1. Birecik
2. Curnê Reş	2. Hilvan
3. Hewenc	3. Bozova
4. Serê Kaniyê	4. Ceylanpınar
5. Sêwregi	5. Siverek
6. Sirûc	6. Suruç
7. Wêranşar	7. Viranşehir
8. Xelfetî	8.Halfeti
9)Semsûr	9)Adıyaman
1. Aldûş	1. Gerger
2. Bêsnî	2. Besni
3. Çêlikan	3. Çelikhan
4. Kolik	4. Kahta
5. Semsat	5. Samsat
6. Serê Golan	6. Gölbaşı
10)Sêrt	10)Siirt
1. Berwarî	1. Pervari
2. Dih	2. Eruh
3. Hewêl	3. Baykan
4. Misriç	4. Kurtalan
5. Şêrvan	5. Şirvan
11)Xarpêt	11)Elazığ
1. Axin	1. Ağın
2. Baskîl	2. Baskil
3. Depe	3. Karakoçan
4. Keban	4. Keban
5. Meden	5. Maden
6. Miyaran	6. Arıcak
7. Pali	7. Palu
8. Qowanciyan	8. Kovancılar
9. Sivrice	9. Sivrice
10. Xulaman	10.Alacakaya

II.Zemîr

Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)

Kirmanckî de di grûbî zemîrê kesî estê. Ma tiya de goreyê meylê kombiyayîşî nê di grûban nusenê:

Grûba yewine
1. ez
2. ti
3. o
3. a

1. ma
2. şima
3. ê

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

Meylê kombiyayîşî.....formê bînî
2. ti.....2. to, tû
3. o.....
3. ew, aw, we, wi, ay, yo, yû, wo
3. a.....3. ya
2. şima.....2. sima
3. ê.....3. yê, yî

Grûba diyine

1. mi
2. to
3. ey
3. aye
1. ma
2. şima
3. înan

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

Meylê kombiyayîşî....formê bînî
1. mi.....1. min
2. to.....2. tu
3. ey.....3. yi, yê, hî,jey, ê, êy, êyî, ay
3.aye.....3. yê, ya, yay, aya, ay, a, ja
1. ma.....1. man
2. şima.....2. şiman, sima
3. înan.....3. yîn, yînî, yîne, jînî, îna, îne, înê, înû, aynan, eyna, ayno

Yew zemîro kesî zî "xo" yo. Frenskî de nê zemîrî ra "pronom personnel réfléchi" vajiyêno. Meylê kombiyayîşî formê "xo" yo, labelê tanî cayan de herûnda "xo"y de nê formî zî vajiyênê: xwe, xwi, xu, ho, hu.

III-Sifet
Rengî

Kirmanckî (kırdkî).....tirkî
sipî, sîs.....beyaz, ak
sûr.....kırmızı
siya, qer.....siyah, kara
şalên, qeweyî.....kahverengi
kewe.....mavi
hewz, kesk, zergûn.....yeşil
zerd, çeqer.....sarı

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê. Nimûne:

Meylê kombiyayîşî.....formê bînî
sipî.....sipe, sipê, sipye
sûr.....sur
siya.....şiya, şa
qeweyî.....rengê qehwî, rengê qawî
kewe.....kewo, kiho, kuhe, kûhe
hewz.....sewz
zerd.....zer, zerk

Mena tanî rengan ca ra ca ciya ya. Nimûne:

kewe (kewo, kiho, kuhe, kûhe): Tanî cayan de yeno mena "yeşil"ê tirkî.

zergûn: Tanî cayan de yeno mena "hewzê zerdinî" yan zî "zerdbiyaye" yî (bi tirkî "sarartı").

zerd: Tanî cayan de yeno mena "altın sarısı" yê tirkî.

IV-Hûmarî

Meylê kombiyayîşî nê hûmaran ser o yo:

11 yewendes
12 diwês/ duyes
13 hîrês
14 çarês
15 pancês
16 şiyês
17 hewtês
18 heştês
19 newês
20 vîst
30 hîris
40 çewres
50 pancas
60 şeştî
70 hewtay
80 heştay
90 neway
100 se
200 di sey
300 hîrê sey
400 çar sey
500 panc sey
600 şeş sey
700 hewt sey
800 heşt sey
900 new sey
1000 hezar
1000 000 mîlyon
1000 000 000 mîlyar

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê zewbîna (sewbîna) formî zî estê:

Meylê kombiyayîşî.....formê bînî
11 yewendes.....des û jû, des û yew, yondes
12 diwês/ duyes.....des û didi
13 hîrês.....des û hîrê
14 çarês.....des û çar, des û çihar
15 pancês.....des û panc, poncês. pûncês
16 şiyês.....des û şeş
17 hewtês.....des û hewt, hotês
18 heştês.....des û heşt, heyştêş
19 newês.....des û new
30 hîris.....hîriş
40 çewres.....çewreş, çores, çoras
50 pancas.....cas
60 şeştî.....şêst, şest, şêştî, şêşt, şeyştî
70 hewtay.....hotay, hawtay, hotayê
80 heştay.....hêştay, hêştayê, heyştay
90 neway.....newayê, noway
500 panc sey.....pan sey, ponc sey, pon sey, pûn sey
700 hewt sey.....hot sey
800 heşt sey.....heyşt sey, hêşt sey
900 new sey.....no sey
1000 hezar.....henzar, hinzar, honzar, hûnzar, hazar
1000 000 mîlyon.....mîlun
1000 000 000 mîlyar...mîlar

Nimûne:

1925 hezar û new sey û vîst û panc
1938 hezar û new sey û hîris û heşt
1997 hezar û new sey û neway û hewt
1567849 yew mîlyon û panc sey û şeştî û hewt hezarî û heşt sey û çewres û new.

Kewasorî pêşleşkerî dijmin

FAYSAL DAĞLI



Li başûrê welatê me perdeya îxanetê ya dawîn û mezintir a lîstika ku dîroka me ya nûjen qeyd kiriye, tê lîstin. Bi daweta Mesûd, artêşa tirk bi çalakiya herî mezin a di dîroka xwe de Behdinan dagir kir. Dîsa bi marîfeta Mesûd, çeteyên tirkmen li Hewlêr, wekî xencerekê di sînga kurdan de hatiye çikandin. Gerîlayên ku li ser tixûbên başûr in, ger ku xerabî bi Mesut kiribin jî, ew nabe behane ku PDK Kurdistanê ji dijmin re pêşkêş bike. Mirov ji kîjan aliyê ve li vê bûyerê binêre, ev îxaneteke mezin e. Ên ku îxancta Mesûd nalet nekin, kî û çi dibin bila bibin, ji kîjan reng, partî û ji kîjan perçeyî, her wiha ji kîjan eşîr û îdeolojiyê bin şirîkê vê îxanetê û bêşerefiyê ne. Vê çalakiya xayinane careke din jî nîşanî kurdan daye ku, dijminê esasî îxaneta nav kurdan e. Heta kurd ji vê qedayê nefilitin, wê ji hemaliya êşan jî nefilitin. Hîç sîstemeke ramanî, olî û kevneşopî li rûyê cîhanê îxanetê 'erê' nake .

Artêşa tirk cara yekemîn di sala 1983'yan de ket başûrê Kurdisanê. Enqereyê bi Seddam re peymana mafê şopa îmze kiribû. Di wan rojan de mirovên Mesûd li ser tixûbên Îranê li Hecî Umran, Gilala û Getmenîl ji artêşa Îranê re milîsî dikirin û êrîşên Iraq, PDK'ya Îranê û YNK'ê dikir. Hêzên Sedam vê salê ji koçberên eşîrên Barzaniyan ku li gundê Quştepeyê îskan bibûn, 8 hezar mêr girtin û li Başûrê Iraqê li ber mîtralyozan qetil kirin.

Mele Mistefa Barzanî, her çiqas xwedî hinek xeletiyan be jî ev şanoya Berxwedana Kurdistanê ye. Kesera welat ew şane bi şane (hucre) kuşt û bedela çewtiyên xwe li xerîbiyê giran da. Lê Mesûdê ku tê gotin kurê wî ye, piştî ku dest danî ser PDK'ê çi kir. Wekî îcraata yekemîn di 1987'an de li 'Siwarê Xelîl' tevî MİT'ê bi sedan pêşmergeyên YNK'ê qir kirin. Piştî destpêka Şerê Îran û Iraqê jî, ji bo artêşa Îranê jî dest bi mîlisiyê kir. Li ser vê yekê gelê Başûr navekî gelek mezin û bi wate li Mesûd kir: "Kawasorî Pêşleşkerî Dijmin" yanî xayinê ku li pêş dijmin dimeşe û welatê xwe dişewitîne. Mesûd dîsa heta sala 1986'an êrîşî hemû hêzên Kurdistanê kir ku di nava wan de YNK, PKK û partiyên din jî hebûn. Di 1988'an de şerê, Îran û Iraqê bi dawî bû. Seddam dest bi qetlîama enfal kir û mirovên Mesûd avêtin derveyî Başûr. Mesûd li ser vê yekê.bang li cîhanê kir û xwest ku qirkirina Seddam li Kurdistan bidin sekinandin û li wîlla ya xwe ya 'Kerecê' li benda fersendeke nû sekinî ku careke din derkevin meydanê. Di Şerê Kendavê de ku gelê kurd serî hilda, Mesûd li ser destkeftiyan rûnişt, xewnên wî bûbûn rastî û ew bubû hakim. Lê wî dîsa ezmûnên bav û kalan vala dernexistin. Piştî salek, di sala 1922'yan de, li ser tanqên tirkan tevî "Mam" li sûka Zaxo di nav çepikan re derbas bûn û êrîşî PKK'ê kir, yanê piştî ku bû hakim, pêşî bavê xwe daleqand.

Di1993'yan de jî Mesûd êrîşî "Mam" kir. Mam çend rojan berê gotibû: "Ez û Mesûd, em her du jî kurê Mele Mistefa ne." "Kak" û "Mam" li dijî hev jî wekî şovalyayan şer dikirin û di vî şerî de, di egîtiyê de di ser wan re kes tune bû. Derna yek diket zorê li tanqên sedam siwar dibû û ew dianîn nav Hewlêrê, yên din baz dida, diçû ser tixûbê Îranê, li panzerên Tahranê siwar dibû û bi şûn ve dihat. Di rexta cahşan de xesar li serê kurdan bû. Ên dimirin seqet diman û mîlîm mîlîm şerefa xwe winda dikirin kurd bûn.

Dostaniya Seddam têrî Mesûd nedikir. Her çiqas Seddam sê birayên wî, 30 mîrov û 8 hezar êşîriyên wî û 300 hezar welatiyên wî kuştibin jî, dostanî û kar ji hev cuda bûn. Jixwe tirkan jî apê wî Evdilselam li sûka Musilê daleqandibûn.

Û dîrok bi xwe civîna miriyan bû. Namûs, şeref, Kurdistan, şêhîd, Helebçe, Kampên Sirgunê, Mele Mistefa, êş û elem û qêrîn. Ev tev hezeyanên romantîkan bûn.

Belê "Kewasorî" di şîzofreniya îxanetê de wisa difikirî. Mele Evdila Begê ku jiyana xwe ya sedsalî li gorî Kurdistan kiribû, digot "Mesudê ku naxwaze kurd bibin, masonek e." Belê Mesûd ne kurê Mele Mistefa ye, ew efsaneya ku jiyana xwe daye Kurdistanê, ne layiqî kurekî wisan e. Em dizanin ku wî kurekî xwe yî din yanî Ubeydullah ji ber îxaneta wî ji ewladiyê avêtibû û ew bi îdamê ceza kiribû. Mesûd ne Barzanî ye jî êdî. Barzaniyan ku ji bo Kurdistanê bi hezaran şehîd dan, mirovekî wisa jixwe qebûl nakin. Ew mehlûqên ku bi emrê Mesûd li tanqên tirk û Seddam siwar dibin û wan dibin ser kozikên kurdan, ne pêşmerge ne. Mafê tu kesî tune ye ku ji wan re bibêje pêşmerge û navê şervanên dîrokî kirêt bike. Û ev çeteya xulaman nikare bibe parçeyekî ku remze Kurdistanê digerîne... Kes nikare vê bankoriyê bike û navê Kurdistanê bide vê organîzasyona dijminên Kurdistanê. Mesûd di warê siyasî de jixwe întîxar kiriye. Divê rojekê berî rojekê di warê fîzîkî de pêwist e ev pêvajo temam bibe û ew ji sînga kurdan bikeve.

Belê gelê me xweş gotiye "Kawesorî pêşleşkerî dijmin", lê li dijî kewênsoran jî, şer êdî barê li ser milê hemû kurdan e.

Şehîdê Sêwreg Deza Ali İhsan Üçkardeş

Tayn embazî estê ke, kes nêşeno jew rojê jî, îna xo vîra bikiro. Nê embazê winayin wa ma rê bibê aşmî, wa bibê astaroka şoreşî. Zewbîna jî, ganê îna wa bibo adirê weşîna ma. Ewro şoreşê ma de kamî ke guniya xo rijnawa her, o embaz biyo rûmetê şarê ma û Welatê ma Kurdîstan. Deza Alî îhsan jî, zey embazanê bînan hemin bi rûmetê şarê ma kurdan.

Ez nêzana ke, deza Alî îhsanî senî biyarî ziwan. Embaz xo Sûka Sêwreg ra bi, verê 12'ê îlonî de, na Sûk de gird bibi, coka jî ey werdiyina xo de lecê şoreşê ma dî bi. Qandê nînana, o keçikîna xo de bibi eşkê lejê azadiyê ma. Hendê zerey pîzedê ey de ters çinêbi. Deza Alî îhsan biyaniya xo de, şerwan ame bi dinya. Vindeyina ey, ê şoreşî de zey Seyit Rizo, dimiliya bi. Qandê ney min ci rê vatê deza. Wexto ke, ma ameyê pêhet, ma pa dimilî kisey kerdê.

Deza Alî îhsan bol kuşetwan bi, vatê: "Mi ewro ti nêdiyê ezo biteqayê".Jû, jû fin jî vatê: "Bêrê ma na dimiliya xo bixemilnê". Jû, jû fin jî vatê: "Deza ti xo kirdasiyê (kurmaciyê) la belê to dimiliya ma tirita û tiyê ma ra nimnenê, no wina nêbeno embaz". Min jî ey rê vatê: "Se kirî embaz, şima na dimiliya maya weşik bêwayir viradawa, ezo jî hendê zanayena xo çadê ci ra tepşena ke, wa vinî mebo. Rastî jî wexto ke, min bi xo jî, o diyê û min pa dimili qisey kerdê û ganê min xo jî biyê şenik.

Deza Alî İhsan fina, rojê bibi meymanê ma. A şew, ma şana heta şefaq roniştbî û pa qisey kerdbî. Ma bol çî sero vinderd bîm. Nînan ra çiyê esta ke, ez hetanî merdina xo nêşena xo vîra bikrî. A jî dezay wina vat bî: "Sûkanê Kurdistanî hemin de roj bi roj serwedarnê şehîdano beno. Şarê, ê sûkanê jî şehîdanê xoya benê tewrdê şoreşî. La belê sûka ma Sêwreg de 12'ê îlonî ra na kişt, şehîdî niyameyê wedarnayin, ma ra kam sifta şehîd bikewo û sûk de, şarî wedarno; o embazo bibo sembola Sêwregî." Wexto ke nê vatê riyê Deza Alî İhsanî abiyayê û çimê ci gird biyê. Zek vajo "Deza a sembol ezo bî."

Embazatêya deza Alî îhsanî jî zaf germ bî. Ey ra kes nêecizyayê. Qeçiya biyê qeç, girdîya biyê gird. Embazanê ey miyand de, qeçê şeş hewt serey jî est bî. Îna ra jû jî, Hîvron bî. Wexto ke, ey Hîvron diyê ci rê vatê: "Embaz ewro to qandê şarê ma se kerd?" Hîvron jî zey kadroyan wina verpers (cewap) dayê û vatê: "Embaz min ewro dibistan de, jû embaza kurd silasnê, ma piya kirdasî qisey kerdî". Na verpers sero dest dayê Hîvron û ameyê rîde ci. Pey ra jî Hîvroni ra vatê: "Ewro min nêşa çiyê bikerî qandê şarê ma, ti mi ra vêşî xeftiyaya. La belê şewra rew eza werzî û şirî xo rê karê bivînî. A nika, ti mi ra veşî biya nezdiya şarê ma."

Jû jû fin jî, ma piya geyrayê. Rojê ma piya şîbîm sînemayê fakûlta çapemeniya unîversîteya Stenbolî. A roj filmê Z kaykerdê zeredê na film de çîkerdişê ke raverdê, ê cûntayê Yûnanîstanî bî. Peydê filmî de ma vijiyayê teber û vera Aksarayî kewtîm ray. Nezdiyê nîm saet ma piya qisey nêkerd. Bahdo jî ma çoşmê Findikzadeyî cayê de roniştê. Min ewna ke, o kewto kaxûdê çiyê. Ay ra jî, min ey rê vat: "Deza se bi?" Deza Alî İhsanî fine, di finî xorî ra nefes girot û verada û peyra jî wîna vat: "Ney filmî de min verniya şarê xo dî. Faşîzm çi yo ,winî aro ke, goniya kesî vindena. Çiman dê faşîzmî de hindê seredê darzîn însanetî çiniyo. Kewna goniya şaran, qeç û qulan, cinî û mêrdan zey mêşan kişenê. Şewra, bîro faşîzmê Tirkiyeyê jî, şoreşvana ra veşî; êyê dekewê goniya şarê ma. To nêdî, serokanê cunta qandê şaranê xoya se vatê. Çimanê înan ver de, şar linciya, şoreşvanî jî mêş ê. İyê eşkere vanê ke, mekewê mêşan pey, linciya xo wişk bikere ke wa meşî bimrê. Şoreş çend ke ver bi ver şiro, êyê şaranê ma qir kerê. Deza Alî İhsan embazo winî bi ke, kerdişanê ewroy ra şewranê şarê xo diyê. O hindê piratîkanê xo, embazeko zana bi.

Deza Ali İhsanî unîversîteyê Stenbolî de Fakûlta Hiqûqî de wanayê. Peydê wanevanêya xo, sera newayin de vejya koyan ser û bi reyayinê gerîlayê şarê Kurdistanî û 27 menga berfanbarî de sera 1992'de mabendê Amed û Dersimî de, Çoşmê laya pêrî de, jew xayinî kişt ra şehîd kewt. Mengê tepya meyîtê Deza Alî İhsanî dewijan dî bi. Wexto ke, meyitê ey ame Sêwreg, serwederneyê gird viraziya. Nezdiyê des hizar merdim kewtê linga û Dezayê mino delal da her. A roj, o şi û bi tewrdê qefîlayê şehîdanê Kurdistanî.



Deza
Alî İhsan,
ti biyê dara tiwêr
Diza Sêwregî sero.
Destandê keçikan de
tasê doy
zilikê piyazî
û nanê gilgilî esto.
Sersiya to bin de
benê gird
û benê şoreşkerî

ZÜLKÜF KIŞANAK

Ji bo temaşavên MED–TV'yê Anket

Wekî tê zanîn televîzyona kurdî, MED–TV'yê 2 saliya xwe qedand û kete sê saliya xwe. Di gel hemû astengiyên dagirkeran, ev televîzyona ku wekî "Televîzyona gelê bêdewlet" tê binavkirin, weşana xwe didomîne. Em dixwazin bi vê anketê bizanin ku gelê me, bi çi çavî li televîzyonê dinêre û weşanên wê çawa dinirxîne. Em ji hemû xwendevanên xwe dixwazin ku vê anketê dagirin û ji me re bişînin. Emê piştî ku encam gihîştin destê me, bersivên we binirxînin û di rojnameyê de biweşînin.

Cihê ku hûn lê rûdinin

.....

Karê we

☐ Karker
☐ Karmend
☐ Esnaf
☐ Xwendekar
☐ Cotkar
☐ Serbest

.....

Zimanê we yê zikmakî

.....

Hûn kîjan zaravayên kurdî dizanin?

.....

.....

MED–TV ci tîne bîra we?

.....

.....

Hûn ji kengê ve li MED–TV temaşe dikin?

2 sal
☐ salek
☐ 2–3 meh

Hûn li ku li MED–TV'yê temaşe dikin?

Li mal
☐ Li cihekî din

Hûn her roj li MED–TV temaşe dikin?

Erê
☐ Na

Li malа we çend kes li televîzyona kurdî temaşe dikin?

.....

Li derdora we di çend malan de MED–TV heye?

.....

Navê 6 bernameyan li gorî rêza jê hezkirina xwe binivîsin.

1).....
2).....
3).....
4).....
5).....
6).....

Hûn zimanê kîjan bernameyan hêsan û bas dibînin?

.....

.....

.....

Hûn zimanê nûçeyan çawa dibînin?

Hêsan e
☐ Giran e
☐ Jê fêm nakim
☐ Baş e

Bi dîtina we bernameyên li ser kîjan mijaran pêwist in?

.....

.....

Ji ber MED–TV'yê we tu tade dîtiye?

.....

Rola MED–TV'yê di pêkanîna yekîtiya neteweyî û careseriya pirsgirêka kurdî de ci ye?

.....

.....

Li gorî we pirsgirêka kurdî çawa careser dibe?

.....

.....

Hûn ji bilî MED–TV li kîjan kanalan temaşe dikin?

....

Hûn kîjan weşanan dixwînin?

.....

www.kurdistan.org

BÛYERINE JI DÎROKÊ

Gündem Özgür

● **26.05.1913:** Komeleya Hêvî hate damezirandin. Damezirandina Komeleya Hêvî ji layê çend rewşenbîr û ronakbîrên kurd ve bi mebesta pêkanîna eniyeke siyasî çandî û huneri ji bo xwendekarên zanîngehan û kurdên ku li Stenbolê dijîn, hate avakirin.

● **26.05.1927:** Serhildana Sasonê dest pê kir.

● **26.05.1995:** Cendekê Hasan Ocak, ku roja 21'ê adarê ji hêla polîsan ve li Aksaraya Stenbolê hatibû revandin, piştî 65 rojan hate dîtin.

● **26.05.1927:** Serhildana Mutkî dest pê kir. Dewleta tirk ji bo ku carekê din serhildanên kurdan çênebin, dest danîn ser çekên wan û ew ji herêmê dûr xistin. Li hemberî van kirinên dewletê, 8 eşîr û 35 gundan li hemberî artêşa tirk di demeke kurt de bi hezaran şervan li herêmê bi cih kirin. Di şer de serokên eşîran Şêx Evdirehman, Mehmed Elî Unis, Zekî Selîm birîndar bûn, serhildan heta 25'ê gelawêjê dom kir.

● **28.05.1992:** Hozan û dengbêj Tahsin Taha çû ser heqîya xwe.

● **80.05.1992:** Rojnameya "Özgür Gündem" li Stenbolê hat weşandin. Rojnameya Özgür Gündem, rojnameya kurdan û mûxalîfê sîstemê a pêşîn bû ku li Tirkiyeyê bi awayekî rojane derdiket.

● **31.05.1971**: Şoreşgerên ji THKO'yê Sinan Cemgil, Alpaslan Özdoğan û Kadir Manga li Çiyayê Nûrheqê hatin kuştin. Û endamê THKP-C'ê Hüseyin Cevahir di heman rojê de hate kuştin.

AWIR

Gelê kurd dîsa dibe qurbanî

MAHMUT KILINÇ

Di stratejiya nû ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) û Îsraîlê bi hev re amade kirine de, rola Tirkiyeyê cendirmetî û ya PDK'ê piyontî ye. Ev êrîşa li ser Başûr encama vê stratejiya nû ye. Bi vê êrîşê, tê dîtin ku stratejiya êrîşa siyasî, aborî û leşkerî ya ku DYA'yê li dijî Îran û Iraqê bi navê "cot–gemaro" dabû destpêkirin, gihîştiye qonaxeke nû. Armanca vê stratejiyê pêşî xistina Seddam û đi cihê wî de pêkanîna rêveberiyeke ji aliyekî ve girêdayî DYA'yê ye. Piştî ku ew yek pêk hat, Iraq jî dibe dewleteke alîkar ji sîstema împeryalîst re. Bi vê yekê jî ewletiya petrola ku ji kendavê û di ser Tirkiyeyê diherike bazara kapîtalîst pêk tê. DYA piştî ku pergala Iraqê li gorî dilê xwe saz kir, îcar wê berê xwe bide Îranê.

Lê hê jî ne diyar e ku wê piştî vê stratejiyê çi derkeve pêşberî DYA û hevalbendên wê. Hê jî DYA û hevalbendên wê ne serdest in di hemû waran de, hin kend û kospên ku li ber vê stratejiya wan dibin asteng hene.

Di vî karî de armanca Tirkiyeyê jî bi saya vê cendirmetiyê, bidestxistina derfeta xeniqandina têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê ye. Her wiha ew dixwaze qerta kurdîtiyê bi dest bixe, bi vî awayî li herêmê zêdetir bibe xwedî gotin. Lê divê em bidin zanîn ku wê Tirkiye nikaribe di vî warî de bi ser bikeve û li aliyê din ew polîtîka wê Tirkiyeyê ji Ewrûpayê dûr bixe û ji aliyekî din ve zêdetir bike welatekî Rojhilata Navîn.

Heke ev stratejiya ku doza guhartina hevkêşeya herêma ji bo berjewendiyên DYA û Îsraîlê dike, bi ser bikeve, dibe kurdên Başûr mafê otonomiyê bi dest bixin. Ji bo vê yekê ez dibêjim dibe ku, lewre tu daxuyaniyên DYA û PDK'ê ku di vî warî de hêviyê bidin nîn in. Li aliyê din ger otonomî pêk were, ew ji bo kurdên Başûr nabe destkeftineke mezin. Lewre gelê me yê ku li ser dîroka Başûr piçekî xwedan agahî ne, baş dizanin ku gelê me yê Başûr ji sala 1961'ê bi vir de destkeftinên di vê astê de bi dest xistine. Di van salan de Iraq wekî welatekî ku lê kurd û tirk dijîn hatibû binavkirin di Qanûna Bingehîn de. Şerê ku dihat kirin li ser sînorê vê herêma otonom a kurdan bû. Lewre jî ev hevkariya PDK'ê ya bi dijminên gelê kurd re ji bilî dîlîtiyê tiştekî nayine. Li vir bi awayekî zelal tê dîtin ku gelê kurd ji hêla van hêzên paşverû ve ji berjewendiyên împeryalîstan re wekî qurbanî hatiye niqandin.

PDK îdia dike ku PKK li herêmê dibe sedema qeyranê, divê bide zanîn ku çi qeyran çêbûye ji ber çalakiyên PKK'ê. Gelo PDK û partiyên başûrî xwestin ji bo gelê me çi tiştî baş bikin, PKK nehişt? PKK bi piştevaniya Îran û Tirkiyeyê êrîşî wan kir? Kîjan çalakiya PKK'ê bû sedem ku Mesûd Barzanî artêşa dewleta tirk û hêzên Seddam vexwîne, da ku ew Kurdistanê dagir bikin?



Xerabiyên ku komara tirk bi gelê me yî Başûr kirine, bi jimartinê naqedin. Tirkiye bû sedem ku hêzên kurd û îngiliz bikevin şer û di vî şerî de hêzên Şêx Mahmûd Berzencî têk biçin. Dîsa di sala 1930'î de peyayên apê Mesûd Barzanî Şêx Ahmed, bi hinceta "sûcên wan" yên di dema Osmaniyan de hatin gulebarankirin. Di sala 1974'an de peymana di navbera Îran û Iraqê de ku bû sedema têkçûna Mele Mistefa Barzanî li ser daxwaza dewleta tirk li Stenbolê hate îmzekirin. Di sala 1978'an di şerê PDK û YNK'ê de MÎT'ê bi çalakdarî cih girt. Dema ku şerê Îran û Iraqê dom dikir di sala 1986'an de Tirkiyeyê rê li ber peymaneke di navbera kurdan û rejîma Baxdayê de girt. Dîsa ji bo kurd li Başûr tiştekî bi dest nexin, Tirkiyeyê zor da DYA'yê. Ev çend mînak in ji kirinên dewleta tirk ên li dijî gelê kurd. Ew polîtîkaya komara tirk hê jî neguheriye. Divê kes xwe bi polîtîkayên ku piştî Özal dest pê kirin û bûn sedema nasîn Talabanî û Barzanî nexapîne.

Divê baş bê zanîn ku giraniya Barzanî û Talabanî ya li Enqereyê û sedema ezimandina wan li wir girêdayî nîştecihbûna PKK'ê li başûr Kurdistanê ye. Hebûna PKK'ê li Başûr dibû sedem ku bi awayekî bêsewiye be jî, ew her du hevkar li Enqereyê bên ezimandin. Dîsa ji ber vê sedemê dewleta tirk destûr dida ku hinek alîkariya însanî di ser Tirkiyeyê re bigihên Başûr. Kesên mîna Mesûd Barzanî ku asoya bîr û ramanên wî bi sînorên eşîra wî sînorkirine, nikaribûn vê derfetê fêm bikin. Lê di vê cîhana mezin de, neteweyeke kurd ku qeyd û bendên koletiyê yên pergala civakî ya kevneperest diqetînin, derdikeve rastê. Tiştê ku îxanetkar navên bibînin ev yek e.

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Pîvanên kurd û kurdayetiyê çi ne?

Kurd û kurdayetî du termên (gotinên) ku têkiliyên wan bi hev du re hene û ji hev du çêbûne. Yanî kurdayetî ji gotina kurd hatiye afirandin. Lê dema mirov ji aliyê îdeolojîk, polîtîk û heta însanetiyê ve bi awayekî hûr û kûr li wate û naverokên van her du terman binêre, baş zelal û diyar dibe ku ev her du term carinan gelek ji hev du cihê û dûr in.

Ew kesên ku dê û bavê wan kurd in an jî bi gotineke din yên ku ji nîjadê kurd in, ji wan re kurd tê gotin.

Kurdayetî jî, ew kesên ku ji nîjada kurd in û xwe kurd dibînin, bi kurdbûna xwe ne semizm, serbilind in, hişyar û zane ne. Li her cihî û di bin her mercên (şertên) giran de, li gorî hêz û îmkanên xwe ji bo mafên xwe yên neteweyî û demokratîk tê dikoşin. Ew azadî û wekheviyê diparêzin. Ji kurdên wiha re mirov dibêje nîştîmanperwer an jî welatparêz. Ew kes doza kurdayetiyê dikin.

Bi kurdî û kurtî her kurd nikare bibe nîştîmanperwer. Ji bo nîştîmanperweriyê divê zanebûn, hişyarbûn û hestên neteweyî bi mirov re hebin. Kesên nezan, malbatperest, dîn an jî mezhebperest, herêm an jî perçeperest nikarin bibin nîştîmanperest an nîştîmanperwer. Nîştîman an jî welat ne heremeke Kurdistanê ye, tevahiya Kurdistanê ye. Rast e îro di pratîkê de welatê me ji aliyê dagirker û împeryalîstan ve hatiye perçekirin, ev rastiyek e, lê ya herî girîng (muhîm) di mejiyê me de, îdeolojî û polîtîka me de heta di pratîka me de yek welat û yek netewe hebe. Di nav me kurdan de ev kêm e. Heta di nav hinek rêxistinên kurdan de ev tune. Ji bo vê yekê jî dîroka kurdan, dîrokeke trajedî û komedî ye. Dîrokeke wiha ye ku di çend salan de carekê dubare û nûcare dibe. Marksîst dibêjin ku di dîrokê de dubare (tekerrur) tune û ev dîtineke îdealîstan e û ne rast e. Ew dixwazin dîrokê serobino bikin. Herhal ev teorî ji bo kurdan derbas nabe. Her tiştên kurdan ne dubare, sedbare û heta hezarbare dibin. Yanî mirov nikare kurdan bi metodên diyalektîk û metafîzîk analîz bike. Ev metod ji kurdan re têr nake, kêm tê.

Barzanî û Partiya Demokrat a Kurdistan a Iraqê ji salên şêstî ve heta niha ev çend car in ku bi dijminên cur bi cur re dibe yek û li ser navê kurdayetiyê êrîşî ser kurdan dike. Bi tirkan re êrîşî ser Elî eskerî û hevalên wî kir û bi sedan pêşmerge kuştin. Bi eskerên îranê re êrîşî ser Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kir, bi sedan kurd kuştin û herêmên azad teslîmî Îranê kirin. Çend meh berê bi eskerên Seddam re êrîşî ser YNK'ê kir. Ji sala 1992'yan vir de jî, bi artêşa tirk re ev sê carên ku êrîşên ser Patiya Karkerên Kudistanê dike. Pêşmergeyên Barzanî derdikevin ser tanq û topên artêşa tirk, ala tirk dihejînin û gerîlayên kurd dikujin. Ew û tirkmenên faşîst bi hev du re li Hewlêrê diavêjin ser nexweşxaneya Heyva Sor û jin û zarokanên nexweş dikujin. Îro li cîhanê sê dostên dewleta tirk hene, Amerîka, Îsraîl û PDK. Ev her sê dijminên gelê kurd ên herî har har û barbar in.

Li her derê dinyayê caş û xayînên gelê xwe derketine, lê tu timtêlî PDK û Mala Barzanî nehatine dîtin û dê neyên dîtin jî. Cahşên (korucuyên) Bakur jî ji wan çêtir in. Ji ber ku korucu nabêjin em kurd in. Li ser navê kurdan partî danemezirandine. Kurdayetiyê qebûl nakin û rasterast bi dijmin re ne. Lê Mala Barzanî û PDK li ser navê kurdan derketine û li hemberî kurdan şer dikin. Mirov ji ber vê yekê dikare bibêje bi rastî malbat û rêxistineke sîxur û ajan e. Jixwe ew ne kurdperwer û nîştîmanperwer in, heta mirov dikare bibêje ku ne kurd in. Bi dîtina min, û gelek kes jî êdî wiha difikirin, ev malbata han ne kurd e. Divê mirov li ser vê yekê baş lêkolîneke hûr û kûr çêbike. Heta hestên kurdan ê herêmê jî di wan de tune. Her wiha fêza (xurûra) feodalî û eşîrtiyê jî êdî bi wan re nemaye. Ew ji hêzên dagirker re bûne çeteyên xwefiroş. Bi pere û xwarinê ji wan re pêşmergetiyê dikin. Her cara ku bi dijmin re dibin yek û êrîşî ser kurdan dikin, ji xwe re destik û behaneyekê jî dibînin. Carekê gora bavê xwe dikin destik, carekê avakirin û parastina federasyona xwe, carekê din xwarin û vexwarina herêm û eşîreta xwe û vê carê jî, di bin serokatiya tirkmenên faşîst ên perwerdekirî de aştî û aramiya herêmê diparêzin (!)

Lê wiha xuya ye, ev cara paşîn e û dê winda bikin, têk biçin. Gel, dê li Bakur û Başûr terbiye û dersa wan bide. Mirina wan hatiye. "Dema mirina nêrî tê, diçe nanê şivan dixwe."

Artêşa tirk ji Başûr derkeve!

Artêşa Tirk bi hêzeke mezin başûrê Kurdistanê dagir kir, di çapemeniya tirk de ji bilî bîlançoya ku Serkaniya Gîştî ya Artêşa Tirk diyar dike, tiştek tune. Wisa xuyaye ku ew naxwazin li ser kirinên hêzên tirk tu tişt di rojnameyan de derkeve, lewre Wezîrê Berevaniyê Turhan Tayan dide zanîn ku heke li ser operasyonê nehata nivîsandin, wê artêş serkeftîtir bibûya. Lê ew helwest, ne helwesteke durist e.

Li hemberî vê helwestê rawestîn, peywira hemû kesên azadîxwaz û demokrat e. Li ser vê dagirkeriyê me lêpirsînek pêk anî. Hinek partiyên dijber bîr û baweriyên xwe wiha anîn zimên.

Fehim Demir
Sekreterê Giştî yê DBP'ê

Em operasyona komara tirk napejirînin. Li gorî me operasyonên bi vî rengî pirsgirêkê çareser nake. Ji ber ku duh jî kirinên wiha bi xwe re çareserî neanîn û îro jî çareseriyê naynin. Pirsgirêka mezin der heqê bicihkirina aştiyê de derdikeve pêş. Hetanî li Tirkiyeyê aştiyeke heqane pêk neyê, pirsgirêk jî wê bidomin. Em wekî hin derdoran nabêjin ev operasyon ji bo Başûr e. Rayedarên tirk dibêjin; li Başûr 'valahiyeke otorîteyê heye' lê em dêhn û bala xwe didinê ku bi dehhezaran leşker ketine Dêrsimê. Herhal kesên ji Başûr Dêrsimê îdare nakin. Ji ber vê yekê jî li gorî me 'valahiya otorîteyê pêşî li vir (bakur) heye. Em dixwazin ku di demeke kurt de dewleta tirk, hêzên xwe ji Başûr vekişîne.

Hedefa vê operasyonê li gorî me, tevgera gelê kurd bi xwe ye. Dewlet nikare demeke dirêj li Başûr bimîne, jê were wê bimîne, lê belê di van şertan de bicihbûna wê ne mimkûn e. Armanca komara tirk çi dibe bila bibe, em dibêjin bila di demeke kurt de ji wir derkevin.

Dagirkirina Başûr, pêşveçûneke erênî ji bo Rojhilata Navîn çênake. Berevajî wê, pirsgirêkên nebaş zêde bibin.

Dewlet dibêje, PKK nemaye lê li hêla din ji 50 hezarî bêhtir dikeve Başûr, ev yek kenê mirovan tîne. Carina derdikeve dibêje pirsgirêka PKK û terorê heye, carina jî dibêje tehdîda îrtîcayê heye, tiştên bi vî rengî parçeyek ji senaryoyên rejîma tirk in.

Li ser helwesta PDK'ê jî em nikarin tiştekî bibêjin, lewre tu daxuyaniyên fermî bi dest me neketine.

Hakan Tanmaz
Endamê Lîjneya Rêveberîya ÖDP'ê

Ev opeasyona hanê ji bo ku li herêmê guherîna hevkêşeya hêzan çêbibe hatiye lidarxistin. Ev operasyon ne wekî operasyonên berê ye ku navên "Bahar operasyonu, balyoz harekatı" û hwd. lê dikirin. Çarçoveya vê yekê hîn dorfirehtir e. Ne bi tene ji bo PKK'ê ye. Piştî civîn û biryarên MGK'ê, operasyoneke bi vî rengî, li Tirkiyeyê dide nîşan ku desthilatî di destê kê de ye.

Em bawer nakin ku Tirkiye demekê dirêj li Başûr bimîne. Ji ber ku konjuktora siyasî ya Tirkiyeyê, rê li ber vê yekê digire. Li Tirkiyeyê otorîteyeke siyasî jî tune ye, ji ber vê yekê jî her çiqas artêşa tirk bi însîyatîfa xwe, bixwaze bi rengekî timî bimîne jî, ev ne mimkûn e.

Naim Sabrioğlu
Cîgirê Serokê Giştî yê DKP'ê

Dewlet der heqê kurdan de çi bibêje derew e! Wekî ku hin kes îdia dikin, kesî kes dawet nekiriye. Li gorî dîtina min çûyîna dewletê ji bo pêşxistina tirkmenan e.

Îro di ser parlamento û hikûmeta Tirkiyeyê re hêzek heye, ev jî îdeolojiya dewletê ye. Biryara dagirkirina Başûr beriya 4-5 mehan hatiye standin. wekî tê zanîn dewlet di 4 demsalên salê de tetbîqetan li dar dixe, lê van tetbîqetan jî di welatê me de çêdike. Em li hemberî vê yekê ne. Dewlet ji bo demekê dirêj nikare bimîne. Di warê gotina ku dibêjin KDP'ê ku dewletê dawetî Başûr kiriye de, agahiyek fermî û zelal neketiye destê me. Daxuyaniyên dewletê yên li ser ziyana ku gihîştiye PKK'ê ne rast in, lewre dema ew hinan dikujin cendekên wan nîşan didin, li wir tiştekî wisa pêk nehatiye.

Murat Bozlak
Serokê Giştî yê HADEP'ê

Li Tirkiyeyê di demekê de ku piraniya gel aşti û demokrasiyê dixwaze, dagirkirina bakurê Iraqê (başûrê Kurdistanê) ji hêla hêzên dewletê ve, kesên aştîxwaz û demokratan êşand. Lê belê em hêvîdar in. Em dixwazin ku ev hereket were sekinandin û hêzên dewletê di demeke kurt de ji herêmê vekişin. Her wiha ji bo operasyoneke bi vî rengî diviyabû biryara parlemento hebûya, lê mixabin biryareke wiha jî tune ye. Ji bo vê yekê operasyon li dijî 'hiqûqa navxweyî' û 'hiqûqa navneteweyî' ye. Li hêla din tê xwestin ku, îmhakirin û valakirina gundên li Başûr jî were kirin.

Heger armanca dewletê, bicihbûna li Başûr be wê arîşeyên mezin peyda bibin. Operasyon ne rast e! Ne ji bo başiya Tirkiyeyê ye jî, dibe ku ev operasyon bibe sedema şerekî herêmî. Li gorî daxuyaniyên KDP'ê, ew jî bi awayekî rasterast beşdarî operasyonê bûne. Di vir de dawetkirina KDP'ê jî heye. Ev tewra KDP'ê nagihe tu encamê.

Li gorî ku em ji çapemeniyhe taqîb dikin kesên û saziyên sivîl bûne hedefên êrîşan. KDP bi xwe jî beşdarî vê êrîşê bûye. Em vê helwesta PDK'ê ya li dijî êrîşa saziyên sivîl tawanbar dikin.

Ragıp Duran
Rojnameger

Di vê operasyona dawî de hin xalên girîng û cuda hene. Hem ji aliyê hejmara leşkeran ve û hem jî ji aliyê teknolojiya ku tê bikaranîn ve , ev operasyon ji yên berê gelekî mezin û xurtir e.

Di pêkanîna operasyonê de mercên hundirîn û derveyî girîng in. Wekî tê zanîn berpirsên artêşa tirk ragihandin ku li cem wan îslama siyasî wekî "terora cudaxwaz" e û diyar kirin ku tevgera kurd têk çûye, niha dora gavên siyasî û civakî yên hikûmetê ye.

Ev operasyon di demeke wisa de pêk tê: Yek ji ber wan mercên navxweyî çavdêriya çapemeniyê hate qedexekirin. Ya din jî wekî her demê ew dixwazin binketinên xwe yên adetî ji çapemeniyê veşêrin. (Peywirkarên MİT/Kızılayê yên ku di dema "Çelik Operasyonu" de hatin kuştin, hê ji bîr nebûne.)

Di qada navneteweyî de jî hevkariya KT û Îsraîlê ya ku RP li dij derdikeve, bi pêş dikeve. Her çiqas RP li dijî vê hevkariyê derkeve jî ev operasyon pêk hat. Her wiha ev operasyon di qonaxeke ku têkiliyên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) û Artêşa Tirk ji berê germtir û xirtir dibin de, pêk tê.

Ji daxuyaniyên wekî "heta ku desthilatdariya Berzanî pêk were, emê li herêmê bimînin", tê fêmkirin ku wê artêşa tirk demeke dirêj li herêmê bimîne. Piştî vê yekê Tahran, Şam û Baxdayê bi çalakiyên dîplomatîk neman, bi çalakiyên leşkerî jî helwesta xwe nîşan didin. Heke bi awayekî hûrbînî li helwesta artêşa tirk a ji bo kêşeya kurdî bê kolandin, wê bê dîtin ku hê jî li kêşaya kurdî wekî "kêşeya ewlehiyê" tê nihêrtin. Di brîfînga dawî ya ji bo çapemeniyê de Serkaniya Gîştî ji bo kurdan gotinên wekî "Hemnîjadên me yên ku li Başûrê Rojhilat dijîn" bi kar aniye. Bi vê yekê jî diyar bû ku helwesta giregirên dewletê neguheriye û li ser riya înkarkirina kurdan dimeşin.

Hevkariya komara tirk ya bi DYA û Îsraîlê re û tehdîtên di serî de li dijî Îran û piştre jî li dijî Iraq û Sûriyeyê (wekî tê zanîn ev her sê welat di rêzên pêş ên lîsteya "dewletên terorîst" ya DYA'yê de cih digirin.), digel van dewletan, welatên ereb û ewrûpî jî derdixe hemberî dewletê tirk.

Bi van polîtakayan artêşa tirk a ku li hundir li dijî du dijminên mezin tê dikoşe, di qada navneteweyî de jî hejmara dijminên xwe yên mezin û biçûk zêdetir dike.

Hikûmeta Enqereyê bi şêweyî pratîk, dersên "kêşeya kurdî çawa çareser nabe" didomîne. Lê dersên bi vî rengî hevkêşeya navxweyî û dereveyî dizivirîne dijî wê.

Nadire Mater
Nûnera Rojnamegerên Sînormenas

Ez dikarim der barê operasyonê de, wekî rojnamevanekî bibêjim ku, bi awayekî giştî agahî nakevin destên me. Rojnameyên Tirkiyeyê di warê ragihandina agahiyên ji yek cihî yekemîn car e ku wekî ew çend kuştin çêbûye, ew çend birîndar hene... Ji bilî vê agahî tune ne. Der barê operasyonê de agahiyên ku em dizanin yekalî ne. Mesela di operasyonên berê de, di çapemeniyê de dihategotin ku 'ge¹ê herêmê ji operasyonan dilxweş e, lê belê ji devê kurdekî Iraqê, me tu car agahiyeke bi vî rengî ne bihîst û ne jî xwend. Di tevahiya rojnameyan de bi tenê tê gotin ku kuştin çêbûne.

Li gorî her kesî ev operasyon jî ji yek 'operasyonê biharê' ye. Li Tirkiyeyê, hewce nake ku êdî ji rojnameyan re birîfing were dayîn. Jixwe rojname hîn bûne, li ku çawa, bi çi awayî binivîsin.

Aydemir Güler
Serokê SİP

Operasyona artêşa tirk ya bi navê "operasyona li piştî sînor" bi tevkujiyan (qetlîam) dimeşe.

Wekî her operasyonê di vê operasyonê de jî li dijî mirovên sivîl, li nexweşxane û dibistanan çalakiyên terorîrstî pêk tên.

Hat ragihandin ku operasyona li ser başûrê Kurdistanê wê heya ku PDK bibe desthilatdar bidome. Lê belê, ev di rastiya xwe de tê wateya dagirkirineke bêmawe. Li aliyekî din, ji bêreaksiyonbûna raya giştî ya cîhane diyar e ku, ev opersayon di bin rêveberiya welatên împeryalîstan de pêk tê û Tirkiye jî di nav wê de cih digire. Hêzên împeryalîst û hêzên paşverû yên Rojhilata Navînî dixwazin tevgera şoreşger ya kurd di xwînê de bifetisînin.

Ev dagirkirin berî çendekî hatibû daxuyandin. Wekî tê zanîn karbidestên leşkerî ragihandin ku 'êdî dema çareseriya siyasî û civakî hatiye.' Diyar e ku, pêşîn dixwazin tevgera kurd a şoreşger qels bikin, piştre jî li gorî berjewendiyên xwe, ji kêşeya kurd re çareseriyekê bibînin.

Xayinên gelê kurd bi tenê ne hêzên Barzanî ne. Bi dîtina me di dema pêşiya me de wê xayinên kurdan hê zêdetir bibin. Tiştên ku wê li dijî vê dagirikrinê bên kirin, eşkere ne. Divê kedkarên kurd û tirk li dijî sîstema dagirker û mêtinger bi şêweyekî tund li ber xwe bidin. Îro MGK partî û saziyên qaşo pêşverû dike pistgirên xwe. Armanca vê yekê pelişandina yekîtiya kedkarên kurd û tirk e.

Em wekî Partiya Desthilatdariya Sosyalîst dixwazin tavilê ev dagirkirin bê rawestandin û artêş hemû hêzên xwe ji herêmê vekişîne. Di vê rewşê de em bang li hemû hêzên paşverû dikin ku piştgiriya gelê kurd bikin.

YNK: Niha ji Hewlêrê faksek hat. Tê ragihandin ku hêzên PDK'yên kirêbûyî hemû cih dagir kirine û kesên ku dîl girtine, tev kuştine. Hevkariya PDK'ê û dewleta tirk xuyaye. Em her dem li dijî îxanetên PDK derketin û em hê jî derdikevin. Komara tirk ev du sal in ku ji me dixwaze ku em PKK'ê wekî rêxistineke terorîst bi nav bikin, lê me ev yek qebûl nekir.

Muhamed Oğuzağa
Partiya Kedê (EMEP)

Armanca rastîn ya operasyonê girêdayî polîtîkayên DYA'yê yên ji bo Rojhilata Navîn in. Ev polîtîka ji bo dagirkirin û çewsandinê ne. Ji bo vê yekê DYA bi Îsraîl û Tirkiyeyê re hevkariyê dike.

Em wekî EMEP operasyonên bi vî rengî yên ku ji bo dagirkirina erdê Iraqê ne, napejirînin û şermezar dikin.

Li gorî rûdanên dawî, nîşanên dagirkirineke demdirêj xuya dikin. Her çiqas 'terorîzma PKK' derdixin pêş, ev tevger bi giranî ji bo dagirkirina erdê Iraqê ne. Her wiha DYA, bi riya Tirkiyeyê dixwaze Îranê qels bike. Ji ber vê yekê dibe ku, di rojên pêşiya me de Îran û Tirkiye şer bikin. Jixwe hevkariya leşkerî ya dawî ya Îsraîl û Tirkiye li ser vê bingehê pêk hat.

Di nav armancên operasyonê de têkbirin û bêhêzkirina têkoşîna rizgariya kurdan jî heye. Hêzên împaryalîst vê têkoşînê ji bo berjewendiyên xwe wekî asteng dibînin. Ji ber vê yekê ji bo ku li Rojhilata Navîn xurtir bibin ji layekî ve jî bi vê operasyonê dixwazin vê têkoşîna rizgariya kurdan bifetisînin.

***

Li Swêdê, civînek ji hêla komîteya şermezarkirina dagirtina Başûrê welat ve hate lidarxistin. Di civînê de nûnerên partiyan bi dorê dîtinên xwe wiha anîn ziman

Partiya Zahmetkêşên Kurdistanê

Komara tirk û xulamên wê li dijî gerîlayên PKK'ê dest bi êrîşan kirin. Bi dîtina me operasyoneke bi vî şêweyî bêyî daxwaza PDK'ê pêk nayê. Wekî her demê artêşa tirk bi rêberiya PDK'ê ket Başûr. Ev ne partiyek e, eşîrek e. Heke di dema xwe de li dijî wan mêrkujan bihata derketin, wiha nedibû. Em PZK bi hemû hêza xwe li cem PKK'ê ne û emê piştgiriya wê bikin.

Partiya Karkerên Komunist a Iraqê

Diyar e ku, ev dagirtin bi piştgiriya PDK pêk hatiye. Komara Tirk dewleteke faşîst û polîsî ye. PDK bi van polîtîkayên xwe dibe hevparê tevkujiyên dewleta tirk e. Dewleta tirk û PDK destbixwîn in û mêrkujên şoreşger û gelê kurd in, em ji Berzaniyên kiredarbûyî re dibêjin dev ji van polîtîkayan berdin.

Partiya Komunist a Kurdistanê

Ji bo hevalbendiya Saddam û Barzanî di nav PDK'ê de kesî dengê xwe nekir. Ev operasyona dawî jî bi daxwaza PDK' pêk hat.

Nûnerê PDK qala parlementoya PKK kir û li dijî wê derket. Lê, niha li başûr sê parlemento h e. Li van deran serbaz û peywirkarên MiT'a tirk di nav keftûleftê de ne. Ev kes ji bo ku gel bikirin, pereyên gelekî mezin xerc dikin. Em vê operasyonê bi şêweyekî tund şermezar dikin.

ERNK

TC û DYA bi dagirkirina Başûr dixwazin Kıbrıseke nû pêk bînin. Çawa ku KT û PDK'ê xwestin bi belavkirina Kampa Etrûşê 15 hezar kurdî ji holê rakin, lê bi ser neketin. Di vê dagirtinê de jî dê bi ser nekevin. Her diçe bingeha PDK'ê qels û lawaz dibe. Ji ber vê yekê bi şêweyekî hovane dest bi êrîşan kir. Belê, PKK terorîst e, an jî KT ya dagirker terorîst e? Em banga xwe ya ji bo PDK'ê dubare dikin û dibêjin ku dev ji îxanetkariya bernede dê digel komara tirk têk biçe.

PDK

Diviyabû ku em ji bo axaftina mijarên girîng li vir kom bûbûna; operasyona artêşa tirk û hêzeke kurd ew qas ne girîng e. PKK ne rêxistineke başûrî ye. Em nahêlin ku PKK li Başûr bimîne. PKK bi qasî heyvekê li dijî me propaganda kiriye. PKK ji bo hilweşandina gundên kurdan bû sedem. Em bi komara tirk re hevkariyê nakin. Me TC dawet nekir. Ev buxtanek e.

Partiya Karê Serbixwe

Em vê êrîşê bi şêweyekî tund şermezar dikin û dixwazin bila hevdîtin bên destpêkirin. Kemalîstên nîjadperest bi piştgiriya DYA û îxaneta PDK'ê dixwazin nexşên (plan) xwe yên li herêmê pêk bînin. Em li dijî vê operasyonê piştgiriya PKK'ê dikin.

Partiya Serbixwe ya Kurdistan

Ew kesên ku hemû pereyên gel di bankayên Swêdê de razandine, PKK bi têkbirina şoreşê tawanbar dikin; tiştekî zor ecêb û seyr! Divê em polîtîkayên bi vî rengî ji binî ve ji holê rakin. Em rêz li kesên ku li dijî îxanetkariya bi serketine bigirin, îxaneta PDK'ê jî ji hemû kambaxiyan derbas bûye. Ku ez li şûna PDK'yiyan bûma, minê xwe bikuşta! Bi vê operasyonê nema dikarin PKK'ê ji holê rakin. Piştgirên PKK'ê bi milyonan in. Ji bo ku careke din îxaneteke bi vî awayî pêk neyê, divê em bi şêweyekî tund şermezar bikin.

YNK

Niha ji Hewlêrê faksek hat. Tê ragihandin ku hêzên PDK yên kirêbûyî hemû cih dagir kirine û kesên ku dîl girtine, tev kuştine. Hevkariya PDK û dewleta tirk xuyaye. Em her dem li dijî îxanetên PDK' derketin û em hê jî derdikevin. Komara tirk ev du sal in ku bi me re peywandiyan datîne û ji me dixwaze ku em PKK'ê wekî rêxistineke terorîst bi nav bikin. Belam, me ev yek qebûl nekir.

Hewkar

Divê em ji bo xurtkirina yekîtiya neteweyî têbikoşin. Dewleta tirk hemû peymanên neteweyî binpê dike û bi Bakur qîm nekir, niha jî dest dirêjî Başûr kir.

ŞALIHÊ KEVIRBIRÎ
MAZLUM DOĞAN

www.kurmanci.org

Çîrokên Helîm Yûsiv

Mirî Ranazin

Bi guhjêkirinê re sibe nema hat, heyv reş dibû û roj jî zerayiyê lê veda. Stêr windayî û veşartî diman. Bi guhjêkirina Remo re birçîbûn, boyaxçî, diz, çete û keleş, di nav taristanê de der dibûn. Bi jêkirina guhê çepê re, helbet ê rastê jî ditirsiya. Dilerizî, pê re pê re ketibû taya sar û germ. Di vê rewşê de wê çi amade bibe di raman û gumanên belengazan de?

Wê çilo vê feleka bextreş bikaribin çareser bikin? Hemû bûne hêjar û perîşan, pepûkiyê li wan dest da., çav rijiyan û kor bûn, nema rastî û nerastî ji hev du der dixistin.

Bêhişî geriya û rû dida, lê dawiyê dest avêtin lêxistina tenekeyê bav û kalan. Gumanên cezb û xişta dest pê kir, da vê rewşê çareser bikin û pê re guhê çepê ji Remo re bi cih bikin, da dayika wî pê şad bibe.

Lê mixabin "Bi xweziya kesî me girtiye qevde keziya"

Belê.. Zengîlê bivehiyê lêxist û diyar e wê rojek bê ku jinên me jî jî me bistînin. Bênder hatin ajotin, genimê zordestiyê hat çandin, serî pelixîn, zîqinî li pisîkê spî hat: Qey qedera me ye ku em heta mirinê kole bimînin. Sed mixabin her tişt ma di reşiyê de, tenê nasname û nifûs mane sor, ji rengê xwe derneketin. Lê hate çirandin bi vizo vizo bayê kur re çû başûrê Redda..

Li Helebçeyê dîlan rakirin. "Dewletê bi sedan kamyonên mişt diran ji dewletan kirîn.... dest bi xwarina çiyan kirin, kevir bi kevir.."

Psîkolojiya lehengên di çîrokan de

Çîrokên Helim diyar e ku katjimêrên wan di zimîniya êşekê de hatiye bikaranîn: "Ramanên gawirî.." Di demên tirs û şepirzetiyê de kurd dibe nêzî Xwedayê xwe û ev psîkolojî yeke pasifî ye.

Dema ku di dawiya têkoşîna azadîxwaz û çaxa tengayî lê tê hev, dest hilnayîne û di nav bahozeke tirsê de baweriyê bi Xwedê û dijmin tîne û xwe dibîne mirovekî gunehkar û gawir, nimûne di vê problemê de pir in, di hundirê dîroka Kurdistanê de.

Piraniya lîder, serokên neteweyê, di dema serhildana xwe de bi hêsanî diketin hembêza dijmin û dihatin xapandin. Lê piştre têne ser hiş û rastiya dirust "Ji wê rojê de Têlo mezin bû.. Kirasê melûliyê çirand.. Helbest ji xwe re dinivîstin."

Belê fêr bû Têlo.. Lê mixabin dîsa bi qelevîska rûnişt û dest bi girî kir.

Çîroknivîs Mamoste Helîm, di civaka kurdên Sûriyeyê de hem mînak û noteyên girîng nîşan dide, wekî hat gotin: Dîsa... dîsa... dîsa bi qelevîska. Ev rûnştina bi vî awayî analîzeke psîkolojî ye di strukturalîsta kurdan de hatiye çandin, ji kevn de şax û paxê xwe berdane. Bi nêrîna min, gerek em nema vê legalê bidin vê prosesa han. Pêwist e em bişkînin û bê parastin bi rengekî realîteyeke rast û dirust bidin tevgera xwe û em beşdariyê bikar bînin di çareser kirinên asê de û em formeya azadî û aştiyê bi pêş ve bixin, de qene êdî nema bi qelevîska em rûnin.



Çîrokên Helim diyar e ku katjimêrên wan di zimîniya êşekê de hatiye bikaranîn: "Ramanên gawirî.." Di demên tirs û şepirzetiyê de kurd dibe nêzî Xwedayê xwe û ev psîkolojiyeke pasifî ye. Dema ku di dawiya têkoşîna azadîxwaz û çaxa tengayî lê tê hev, dest hilnayîne û di nav bahozeke tirsê de baweriyê bi Xwedê û dijmin tîne.

Çima mirî ranazin

Navê pirtûkê "Mirî Ranazin".. di destpêkê de ez matmayî mam, dema çavên min lê ket, bi rastî min qet bîr nebir, min ji xwe pirsî: Çelo çima "Mirî Ranazin" û ne çima "Mirî Narazin" ? Lê dawî ez di hin tiştan gihîştim ku navnîşan rast û rind e ji ber:

– Asîmanek pir fireh û bilind di navbera gotinên mirî ranazin û mirî narazin de heye.

A. Ya yekemîn mutleq e û ya duyemîn nisbî ye

B. Ya yekemîn ango mirî tu carî xew nakin

C. Ya duyemîn ango mirî vêga xew nayê, lê piştre gereke bê.

Bijartina navnîşana çîrokên Helîm, di cihê serfiraz û zanyariyê de ye. Mînakên din ez dikarim bibêjim:

Di çîroknivîsîna kurdî de formeke nûjen

Mamoste Helîm hin hevok û wêneyên toreya erebî wergerandine li kurdî, wek nimûne "Çavên mişt pirs", "ramanên qedexe", "herdu lempên tijî şîr"

Lê di warekî din de nikaribû wergerandinê bi kar bîne, wekî nimûne "heyv veşartî dima..." Pêwist e em bibêjin ku çîroknivîs hin hevokên nû jî peydekirine û bikaranîne wekî "Hatina biyaniyan li herêma Cezîrê, li Kurdistanê, Rojava û rakirina bênderên gundiyan, ser pelixandin, Sînema Amûdê, Serqutkirina giya, bêhn, şaşîtiyeke dîrokî ye, şermola evîndaran..."

Çîrokên Mirî Ranazin gavek li pêş ew in, di formeke nûjenî de hatine amadekirin.

Ez bawer dikim ku rojên tên de wê pênûsa mamoste Helîm baştirîn û ciwantirîn bê axaftin, çi di warê rêziman û gramera kurdî de, yan jî di wêne û avakirina hevokên nû de.

Daxwaziya min ew e ji çîroknivîsên hêja ku di berhemên xwe de ji desthilanî nekevin, ji ber ku ew pirsgirêk hîn berdewam in û wê ji holê rabin bi saya tevgera azadîxwazên welatparêz. Di navbera ketin û rabûnê de demek pir hindik derbas bûye û ev çirokên hatine serê gelê me, bêguman wê çareser bibin. Lê daw û serhildan nû dibe û dîlan xweş dibe.

BAVÊ ŞILÊR

Bavê Şilêr: Li Başûrê Bîçûk di sala 1952'yan de li gundê Cimayê (Qamişlo) ji dayik bûye. Berhemên wî yên çapkirî: Pirtûka Xwarinên Kurdî – 1994 û destnivîsekê amade dîsa bi navê Saz û Pîşên Kurdan

Çalakî

Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **25.05.97 Yekşem:** Sohbeta li ser 'Faşîzm, împeryalîzm û têkoşîn', Ahmet Taştan, saet:18.00

● **30.05.97 În:** Belgefîlmê İsmaîl Beşikçi: "36 pirtûk, 13 zîndan", saet:18.00

● **31.05.97 Yekşem:** Ji Beksavê konsera 'Grup Yenigün', saet:14.30
Ji Tohum Kültür Merkezi şanoya Barbara Halk Sahnesi 'Warê Me (Bizim Ora)', saet:18.00
Li NÇM'ya İzmîrê

● **25.05.97 Yekşem:** Bîranîna şehîdan, saet:14.00
Tiyatroya EKSM Halk Sahnesi "İşkencenin Güncesi (Rojnivîska îşkenceyê)", saet:16.30
Belgefîlmê İsmail Beşikçi, saet:18.30

● **30.05.97 În:** Panela 'Dîroka ziman û hêvotina bi zimanê zikmakî' Hidayet Tutkun, Servet Bakir, saet:18.30

● **31.05.97 Şemî:** Roja xwerinên kurdî yên toreyî, saet:18.30
Li BEKSAV'ê

● **31.05.97 Şemî:** Forum: 'Têkoşîna windahiyan gihiştiye kîjan qonaxê'
Berat Günçıkan, Yusuf Çetin, Tomris Özden, Baba Ocak, Süleyman Gültekin, Ali Ocak, Mürvet Özgen, saet:19.00

AWIR

Li Başûrê Biçûk du çalakiyên toreyî

Şeva 30'yê Avrêlê li Laziqiyê li ser toreya kurdî şevek li dar ket. Mijareke ku di şevbûhêrkê de hatin zimên jî têkiliya şêwe û naverokê bû nivîskaran dan zanîn ku pêwist e nivîskar girêdayî doza welatê xwe be, lê divê bilindî û spehîbûna nivîsarê jî ji bîr nebe.



Şeva 30'yê avrêla 1997'an li bajarê Laziqiyê, şevek li ser Toreya kurdî li dar ket, beşdarên şevê Jan Dost û Helîm Yûsiv bûn.

Kesên hazir ji xwendevanên Zanîngeha "Tişrîn" bûn. Hejmara wan gihîşt çil xort û keçên xwendevan, Jan Dost çend helbestên xwe yên kevn û helbesteke nû û balkêş xwend.

Û Helîm Yûsiv çîrokek nû bi sernivîsa 'Sînorên bombekirî' xwend. Piştî bêhnvedanê deriyê dan û standinê vebû, her du nivîskaran bersiva pirsên haziran dan û bi firehî li sar rewşa pirtûk û toreya kurdî rawestiyan. Her du nivîskar pirsên li ser mijara trazokirin (mewzûn) û rola kît û tîpên dengdar di helbesta kurdî de û têkiliyên di navbera mûzîk û helbestê de, rola toreya kurdî di civakê de bersivandin. Her wiha ew hinekî bi êş li ser pêwendiya qels a di navbera xelk û pirtûkê de rawestiyan. Digel problemên zimanê kurdî, tîpên erebî û latînî, pirsgirêkên zaravayan, her du nivîskar li ser nûjeniyê jî sekinîn. Ji ber ku pirs hatin kirin li ser dijwariya têgihiştina xwendevan ji nivîsên nûjen, Helîm Yûsiv û Jan Dost li ser vê mijarê din jî ditin û ramanên xwe diyar kirin. Mijareke ku di şevbûhêrkê de anîn zimên jî têkiliya şêwe û naverokê bû, her du nivîskaran dan zanîn ku pêwist e nivîskar girêdayî doza welatê xwe be, lê divê bilindî û spehîbûna nivîsarê jî ji bîr nebe, çimkî nivîsara toreyî berî her tiştî avayiyeke hunerê ye, teknîk girîng e, ne tenê mijar û naverok belê form ew bi xwe bingeh e, vê babetê rê le ber rexnekirina helbestên Cegerxwîn vekir, ku çawa bi giranî Cegerxwîn girîngî dida babetê, û şîret û fêrkirinê, helbestên xwe kiribûn peyvên trazokirî (mewzûn). Ango nirxên xebatkarî di helbestên wî de bilind bûn, lê nirxên helbestî gelekî qels û kêmbûn, vê rûniştinê dora du saetan dirêj kir,piştre bi îmzekirina pirtûka Jan Dost, Sazek ji Çavên Kurdistanê, şevbûhêrk qediya.

Her wiha roja 15'ê gelawêjê, li Helebê 'Koma Xanî' ya wêje û çanda kurdî şeva piştgiriya pirtûka kurdî li dar xist. Bêhtirî 60 keç û xort beşdarî vê şevê bûn. Di şevê de Jan Dost çend helbestên kevn û nû, li ser şerê başûr bi navê "Pêşengeha helbestên kevn û nû, li ser jiyana zanîngehê xwendin. Piştre deriyê gotûbêjan vebû û mûnaqeşeyek serbest û germ di navbera her du nivîskaran û xwendevanan de çêbû. Bêhtir pirsa belavkirina pirtûka kurdî hate rexnekirin. Şevbûhêrk bi çend stranan gihîşte dawiyê. Li dawiyê Helîm Yûsiv û Jan Dost pirtûkên xwe 'Mirî Ranazin' û 'Kela Dimdimê' ji beşdaran re îmze kirin, wan jî bo protestokirina nexwendina pirtûkan her du pirtûkên xwe bê pere pêşkêş kirin.

AZADIYA WELAT/ LAZIQIYE

TÎŞK

LERZAN JANDÎL

19'ê gulane û raştiye

Roja 19'ê gulane çê de kampûterî ser ro xebetiyêne, xaftil de vengê marşa şariye/mîliye ya tirkan amê rê goşê min. Mi vat, no çik o? Almanya de marşê şariye? Bado min rind goş nare ser, ke raşt marşa şariya tirkan a. Qey dewlete nava jî 19'ê gulane resmî pîroz kena!.

Ebi raştiye jî roja 19'ê gulane dest ci kerdena cengê şarlye yê tirkan o? M. Kemal ebi nê armancî şiyo Samsun? Ma û tirkan piya no ceng viraşto û welat piya xelesno ra? Na ca mordem ganî tenê vindero û bifikiro?

M. Kemal se, ebi çi armancî şî Samsun, an jî amê ruşnayene û fonksiyonê dê çik bî? Her çi ra ver eke ciwabê nê persan û yên bînan amê dayîne, mordem şîkîno mana na rojê tayîna zelal fam bikero.

1919 de zê her cayî derdorê bahrê siyaye de çetê û firarî bî. Nîna ra ew jî Topal Osman bî. Gerê nemusulmanan ser Paşayê Osmaniyan M. Kemalî, ya Mîrlîva M. Kemalî, Mufetîşê Artêşa 9îne ruşneno Samsun.

Paşayê osmanliyan Mîrlîva M. Kemal teba 21 hevalanê dê roja 16'ê gulane rûşneno Samsun, ke sere de Topal Osman û çetanê bînan pê bicêro û nînan biruşno Stanbol, ke ceza bidêrê nînan. M. Kemal ke teba 21 hevalê xo roja 19'ê gulane, restî Samsun ere bîliya pêguretena çeteyan, firaran nêketî, la belê nînan de dostiye girê dê, nê kerdî mordemê xo. M. Kemal roja 29'ê gulane 1919 de Topal Osmanî, mordemo ke ganî pê bicêro û biruşno Stenbol, vîneno.

No nimûne teyna xo ser nîşanê ê çi yo, ke M. Kemal seba raxelesnayena welatî, ebi gemiyêde qij û xirabe, teyna bêkesî, nêşiyo Samsun. Yanê Paşayê Osmanliyan ra nêremo, Paşayê Osmanliyan bi xo M. Kemal ruşno.

M. Kemal ke reseno Samsun nê çeteyan pê gêno û ne jî seba demokrasî, laîsîzmî û çiyanê bînan xebetiyo. Eke na ca karê xo yo çetayan û firaran keno temem, derbazê Amasya û bado jî derbazê Erzorumî beno. Na ca ebi hetkariya generalanê osmaniyanê bînan û hetkariya kurmancan-Çimke kurmancan, seranê 1916'î ra, demo ke Silîvan de bî, rind şinasneno û mabênê dê û axayan û şêxanê rind o, însiyatîfê Kongreya Erziromî (23.7.1919) keno xo dest û seba raxelesnayena xalîfeyî, ummetê Mehemedî qerar veceno. Nê qerar ser rojî dest bi karê xo kenê.

Ma şarê ma wo kirmanc, yanê şarê ma wo ke Koçgîrî de, Dêrsîm de bî tawa zerê nê xebatî de ca guret? Nê, nêê. Çimke seranê 1919 hetanî 1921-22 Koçgîrî hemverê nînan veciyo, Dêrsîm wuncuya zê Koçgîrî yo. Nayê dewlete bi xo jî vana. Roja tenge de vana ma birayê yewbînan îme, roja hîraye de raştiye zaf koranê ma ra rindêrî, mewazo jî, ana birayê yewbînan îme, roja îraye de raştiye zaf koranê ma ra rindêrî, mewazo jî, ana re ziwan. Naye ra di raştiyî vecînê. Ya yewîne: Çiyo ke îdeolojiyo resmî, verziyonê dêyê bînî vanê, yanê M. Kemal seba raxelesnayena şaranê Anatoluye xo ser û teyna şiyo Samsun, zur a. Ya didîne: Ma, yanê zafêriye jî kirmancan piya hemverê yewnanan û ê bînan ceng nêkerdo, ma na dewlete piya nêviraşta. Yane ma na hezar sera piya nêbîme.

Dewlete, îdeolojiyê resmî ebi zuranê xo şarê ma, şarê ke Tirkiye de rê, ebi dek û dubarî, ebi hêrnayên û tersî xapitî. Nînan welatê ma heremna şenik bî, na bes nêbiye, ewro jî, nafa jî welatanê şaranê bînan heremnenê. Se vanê: "Hetanî ke can mevecîno, xuye nêvecîna". Hênî ke nêbo ebi senê rû erîş bena parçêde welatê ma ser.

Ji devê dengbêj Salihê Qûbînê:

Kilama Hesoyê Brahîm û Şerê Hethetkê

Hethetkê gundekî Qubînê ye. Kesêr li gund dimînin, ji eşîra Reşkotan in. Hesoyê Brahim serekê mala Nasir e. Ji eşîra Sînika ye. Navê gundê Hesoyê Brahîm Zercilê ye ku girêdayî Batmanê ye. Girê Qîre di navbera Hethetkê û Zercilê de ye.

Hecî Mihemedê Mistê serokê Reşkokan tevî 6-7 siwariyên xwe ji Elîhê ber bi malê ve tên.

Gundên Sînika (Hesoyê Brahîm) Zercîlê, Kanîrewa, Bahezîrg, Girêreş, Basorkê, Bilêyder, Gundên Reşkotan (Hecî Mihemedê Mistê), gelek in. Çend ji wan Hethetkê, Hiznamîrê, Bolindê, Tapiyê, Dilbêsa, Licikê, Xilika, Malê Newalê, Hicrê, Texeriyê (Gundê êzdiyan), Kelokê, Kurtıkê û Zivingê ne.

Rojek ji rojan, (beriya 40-45 salî) dema ku Hecî Mihemedê Mistê bi çend siwariyên xwe ve têne gundê xwe yê bi navê Hiznemîrê û Bolindê, li serê Girê Qîre Hesoyê Brahîm ku mezinê eşîra Sînika ye birayê xwe Mihemed Elî dişîne pêşîya wan, ji ber ku ew bêyî destûra wan di ser gundê wan re derbas bûne. Her wiha ew dixwaze hîn bibe ka ew kî ne, ji mala kê ne, navên wan çi ne? Mihemed Elî ji Heso re dibêje: "Rêwî ne, bi riya xwe de diçin, tu elaqeya me bi wan tune, dev ji wan berde." Lê Heso mirovekî axa ye, zalim e. Careke din birayê xwe Mihemed Elî bi ser wan ve dişîne. Pirsan ji hev dikin. Hecî mihemedê Mistê wiha dibêje:

Ez Mistê Quto me, ferxê mala Ezo me, min tu car navê xwe ji kesî re negotibû.

Dibê ez vê tanê li ser kolosê bavê xwe nahêlim, ez vê tirê di nav şalê mala Nasir de nahêlim.

Dibê wîla wayê mala Quto û mala Nasir di kevanê Qîrê de li ser Kaniya Badereşê, li milê Tapiyê, li hev û din aliyane, wekî şîşê mencenîqê, wek kurê hedada li ser serê hev dadane.'

Mihemed Elî gazî dike: Heso rabe lez ke, bilezîne

Sê toqê devreşê bide Rizgo ji min re bişîne

Îro me cewabên hev daye, tê daim bela me û xelkê teklî hev bikî

Tê bêjî were li mala xwe rûne, axawo wîla wayê.

Siûda min çûye, îro îqbala min nayê

Min êrîşa ewilî darbek daye li Silêman û Bazo

Laşê wana maye li Kevanê Qîre, li ber tîrêja tavê,

Ez çi bikim? Îro fîşek di sustemê de maye asê/

Ez dikim nakim bi şîşa tifingê, bi serê kûriya xencerê jê dernayê

Hawara wan zehf e, hawara me file û êzidî ne

Tu qayil bî ne qayil bî, îro wê mala Quto koka mala Nasir biqelînin ji dinyayê.

Qey tu nizanî roja ku roj reş bibe rev bi kêrî her çar peyayê mala Nasır nayê.

Wîla wayê, wîla wayê

Sê şad û şirûdê Hecî Mihemedê Mistê bavê Sebrî hene li dinyayê,

Sê denga li axê Xisarka û Pîloka dikir gazî: Bavê min buno lêxin,

Êvar e roj nemaye, termê Silêman û Bazo li mila Tapiyê, li ber tîrêja tavê maye, îro heyfa van xweşmêra li erdê maye,

Reşo gazî dikir: Hecî Mihemedo navê xwede bide, êvar e, hê ro zû ye, min derbekî daye Hemîd zava ye,

Derba dido ya daye li bejn û bala Xalîd kevnika li ser desta ye,

Min derba sisêyan daye bejn û bala Rizgo cilê resmî lê ne,

hikumeta Elmedîna îro li erdê maye,

Min derba çara daye bejn û bala Mihemed Elî bavê Xezebê kewê sekekirî, roja ku biqewime, mêrekî bi seda ye,

Min derba pênca avêtiye Hesoyê Brahîm ez nizanim ne sax e ne birîndar e.

Mirîdê şêxê Zîla ye bi lingê hespê boz reviyaye,

Min Heso ne kuşt min ji bona derd û kulê dinyayê ew berdaye.

Wîla wayê wîla wayê...

Çîrok

Di vî şerê Qîre de, di rojekê de çar birayên Heso bi navê Hamit, Xalid, Rizgo û Mihemed Elî hatin kuştin. Du heb ji eşîra Reşkotan jî bi navê Silêman û Bazo hatin kuştin. Hesoyê Brahîm piştî kuştina çar birayên xwe çû Wêranşehrê, cem Brahîm paşa. Lazimiya ji sîleh bigire hetanî mermî ji xwe re anî, hate gundê Zercilê û Bahezirq ê koma xwe çêkir, hawara xwe bi file û êzidiyan anî, gotin emê bavêjin ser Hethetkê, emê bistînin heyfa xwe. Mihemed û Elî birayê hev in, Reysê jî kurê mamê wan e. Ev her sê zilam mêrxas in, jêhatî ne. Neyarê wan Hesoyê Brahîm dibêje: "Eger ji wan her sê kesan yek bifilite, wê heyfê bikine deh heyf, divê yek ji wan xelas nebe.." Heso deh zilaman dixe hewşa Mihemed, deh zilaman dixe hewşa Elî û deh zilaman jî dixe hewşa Reysê. Sê zilaman dişîne ser xaniyan, yek jê diçe ser xaniyê Mihemed, yek jê diçe ser xaniyê Elî, yek jê diçe ser xaniyê Reysê. Ji Mihemed re dibêjin Elî kuştin; Ji Elî re dibêjin Reysê kuştin, ji Reysê re jî dibêjin Mihemed kuştin. Her sê bi hev re derdikevin, lê kemîn di hewşê de hatiye danîn.. Zilamekî ji eşîra Reşkotan bi Heso re ye, bi zimanê Reşkotanî (dimilkî) hawar dike û dibêje: "Hesoyê Brahim talanê Bolindê û gundê qarşî wan bir."

Wexta ku hawar li gund digere û deng bi tivingan dikeve, herkes ji mala xwe radihije tivinga xwe û derdikeve hawarê. Eskerên Heso jî di nava gund de cih girtine. Kî derket eskerê Heso ew kuşt. Wê şevê di şerê Hethetkê de 12 mêr û pîrekek hatin kuştin.

Diya Mihemed û Elî Eyşê, li ser wan ev kilama hanê got:

Eyşê dibê Mihemedo lawo.

Mihemedê min keya ye, Elî zava ye, Reysê gul çîçekê civata ye.

Fata reben qebika li ser sêwiya ye.

Eyşê dibê Mihemedê min keyaye, Elî zava ye,

Sibehê min dît Mihemedê min sekinî li ser banê xêniyan,

şalwalê Mihemedê min giran e xwe berdaye, li ser gozeka paniya piya,

Kula Xwedê bikeve derê bavê Hesoyê Brahîm.

Hûtê Bişêriya şeva nîvê şevê kete devê derê mala bavê min,

weke kupê jehrê di devê deriyê mala bavê min de rijiya.

Eyşê dibê Mihemedo lawo

Anî sed caran bi min anî,

Hesoyê Brahîm li Zercilê, li Bahezirqê, şewr û mişawira giran danî,

Qralê fileha, qawalê êzidiya bixwe re anî,

Girte ser Hethetka mala bavê min rebenê ji xwe re bi koşk û xanî.

Eyşê dibê Mihemedo lawo

Hethetka mala bavê min rebenê bişewite, bi xox û tirî

Giran e eskerê Hesoyê Brahîm bi tevî qralê fila ve, qawalê êzidiya avête ser Hethetka mala bavê min rebenê bi sê ciha ji xwe re diwirin.

Eyşê dibê Mihemedo lawo, ezê derêm li ser banê xaniya,

Ji xema dilê xwe û te re ezê gazî bikim hawar e,

Hecî Mihemedê Mistê bi pismamê xwe re xwar e.

Koma Reşkotan hevalê xwîna sar e,

Hesoyê Brahîm ji bab û kalê xwe ve neyar e.

Hesoyê Brahîm ji mala bavê min qeland tovê xweşmêra, ji mala roviya

Eyşê dibê Mihemedo lawo,

Anî bi min anî, min dî Hesoyê Brahîm xencer li ser singê Mihemedê min de bir û anî,

Tivinga qesetûre, li ser laşê mihemedê min hilanî.

Eyşê dibê Mihemedo lawo,

Hethetka bavê Mihemed û Elî û Reysê,

Ez diketim, şev çile bû, berfê lê kir, erd spî kir,

Ez ji taxa xwarî ji ser termê Têloyê birayê xwe dageriyam, hatim taxa jorî,

Ez li termê Mihemed û Elî rast hatim, kezep şêrîn e,

Têlo birawo gazina neke, min şîn û qedera te ji bîr kir,

Dayê dayê qey îslamî ye lawo?

***

Eşîra Reşkotan û eşîra Sînika bi sed caran şer kirine, şerê Hethetkê jî yek ji wan e. Ji 50'î zêdetir mirov ji hev kuştine. Piştre Eşîra Sînika û Reşkotan li hev tên. Sebebê qatilê 12 zilam û pîrekekê Hesoyê Brahîm, piştî vî şerî bi 25-30 salî, gava zeman xweş dibe tê Batmanê, ji hêla Emerê Perîxanê ve tê kuştin. Emerê Perîxanê jî, ji eşîra Ramiyan bû. Piştre Emerê Perîxanê dibe ajanê dewletê, ji ber vê yekê jî mala Perîxanê, li derdora Eşîra Sînika, Reşkotan û Bekira bi tevî leşkeran dest bi zilmê dike. Eşîra Bekira, derbeyeke pir mezin li mala Perîxanê û leşkeran dixe. Dema Emînê Perîxanê direve, leşkerên tirk xwe diavêjin Ava Bişêriyê, tê salexdayîn ku bi hezaran leşker di vê avê de xeniqîne. Piştî ku çem ava xwe datîne, derdorê gundiyan sîlehên leşkeran bi qantiran ji xwe re dibin.

Heta îro jî 27 gundên Bekira bûne yek û nebûne cerdevan, tu car bi dewletê re têkilî dananîne. Gundê Bekira ev in ku li derdorê welatparêz têne naskirin: Dehlikê, Kufîfê, Bekirxan, Şelmo, Smaîlka, Kaniyaberê, Holê, Zeynika, Selîbê, Zîla û Kizlalê.

BERHEVKAR: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

www.kurdishlibrary.org

Ji Weşanên Axîna Welat du pirtûk

Axîna Welat rojnameyeke kurdî ya 15 rojî ye ku li Moskovayê ji hêla kurdên azadîxwaz ve tê weşandin. Kesên di Axîna Welat de, digel rojnameyê pirtûkan jî diweşînin. Du pirtûkên ku di nav Weşanên Axîna Welat de derketine bi dest me ketin. Yek ji wan pirtûkan li ser rêziman e, ya din jî pirtûka helbestan e.

Pirtûka li ser rêzimana kurmancî ji hêla Bavê Nazê ve ji bo xwendekarên pola 3–8'an a fêrgeha seretayî hatiye amadekirin. Pirtûk, ji beşên axaftinê bigire heta rastnivîsa hinek bêjeyan, li ser gelek xalên rêzimana kurdî radiweste. Bavê Nazê di piraniya xalên rêziman de li ser şopa Celadet Bedirxan dimeşe û zêde cudatiyeke di navbera dîtinên wî û awayê redaksiyona Azadiya Welat de nîn e. Lê di hinek xalan de ji vê xetê avarê dibe. Bo nimûne, li gorî dîtina wî gava qertafê cînavkê paşgînkirî û lêkera bûn gava piştî navdêr tên, heke navdêr bi dengdêr biqede divê cuda bê nivîsîn, lê heke navdêr bi dengdar biqede pê ve tê nivîsin. Mînak: "Ez başim" û "ez spehî me." Ji ber ku navdêrê baş bi dengdar diqede /im/ pê ve hatiye nivîsîn. Bi dîtina me ew yek vê tevliheviyê çêbike û lewre jî ne di cihê xwe de ye. Her wiha ne dirust e ku mirovek çi tiştî rast dibîne di heman katê de pê kar bike. Heta li ser lihevkirinek çênebûye, divê rêz û rêçik li gorî dilê şexsan neguherin.

Ji bilî vê xalê pirtûk baş hatiye amadekirin û wê gelek sûdê bigihîne kesên ku dixwazin rêzimana kurdî hîn bibin.

Pirtûka duyemîn a emê li serê rawestin, her wekî me li jor jî daxuyandin pirtûka helbestê ye. Ev pirtûk ji hêla H. Sefkan ve hatiye nivîsîn. Navê pirtûkê "Bîstikek tije sal" e. Pîvanên pirtûkê wekî pirtûkên berîkê ne, berg û nava pirtûkê bi wêneyên xêzkirî hatiye xemilandin. Pirtûk ji 108 rûpelan pêk hatiye, Yêlêna P. li gorî mijara helbestan jê re xêz çêkirine. Helbestên H. Sefkan bi giranî li ser doza neteweyî û evîna gel û welat in. Bi taybetî helbesta bi navê "Ev çi sebr e?" gelekî li rojevê tê, lewre jî em dixwazin, li vir bidin.

Hêê...
Çiyayên me,
Ev çi sebr e?!
Mîna kurmên bi jahr,
ketine canê te.
Dikizirînin pincarê ser sînga te.
Diqelêşin,
diderizînin tehtên te.
Ev çi aram e?!
Çawa dikarî hilgirî
lehiyên ji êgir?!
Baranên kîmyewî,
perçên ewrên ji F.14'an
û fantoman
û zîpikên bombeyî.
(...)
Ev çi Aram e?!
Çi sebr e?!
Li ser sînga te ,
dişewitînin
kurmik û kêzikan.
Hildiweşînin
hêlînên kevokan,
bi saxî diperitînin,
dibrêjin çêlikên wan.
Dijminên Xwedê,
dijminên ezman,
dijminên erdê,
dergûş û pêçekên zarokan,
çawa naherife? Teht û kevirên te
di bin cezmeyên bêjiyan û
çaroxên bêbextan de.
Ev çi seb re...?
Çiyayên me?

Di van rojên ku dîsa îxanetê serî li başûrê welêt rakiriye de helbesta bi navê "Strana Reş" gelekî watedar e.

Strana Reş
Ne cara yekê ye...
Li vê helbestê guhdar dikim.
Kilasîk e êdî ev melodî,
ev strana reş.
Tal e.
Kelê ye.
Kal e.
Naçe xwarê di gewriya min re.



Dîsa jî dadiqurtînim.
Her ev stran e.
Strana reş.
Dîsa deqek kurmî ye.
Li sêveke Xelatî.
Dîsa ew in,
ên berê ne.
Dîsa xwe di zinaran re werdikin
bedew Bêrîtanên me,
ji destê strana reş.
Lê heya kengî?
Mixabin êdî îxanet, bi tenê li çiyayan êrîş nake, êdî êrîşî ser nexweşxaneyan dike, birîndaran dide ber guleyan.

SAMÎ BERBANG

Xewnên helbestvanekî

JAN DOST

Ev e Diyarbekir! Xortê li kêleka min, destê xwe ji pencereya otogarê derxist û Ameda şewitî şanî min kir, di hişê min de raman hatin kilandin, wekî dewê di meşkê de, dilê min lêxist, min got hindik maye ev dil ji nav parsûyên min bifire, serê min giran bû û bi vî awayî ez ketim binê deryayeke mezin û kûr ji xewneke dirêj.

Li Amedê nêzik parka xwendekaran, heykelekî bilind ê M.Doğan kete çavê min, wî bi awirine tûj û kenekî biharî li Asoya Sorikî dinêrî, bejneke bilind, agirekî gur di bin de vêketî bû û li jêr lingên wî di nava êgir de bi tîpine ji zêr wiha nivîsî bûn: "Berxwedan jiyane!" Ez bête nêzîkî wî heykelê pîroz bûm, min çavên xwe carekê du caran miz dan, min dît ku ez li ber heykelê Atatürk im û li binî nivîsandine: "Ne Mutlu....!..." Nû min nas kir a ku min pêşîn dît xewn bû

***

Li Bazîdê, di nîvê wî bajarî de, çavê min li heykelê Ehmedê Xanî ket, Mem û Zîn di destê wî de bû û li Çiyayê Agirî dinêrî, Agiriyê pozbilind jî, wekî her carê serê wî di nava ewrên spî de bû û li destana Mem û Zînê guhdarî dikir. Wekî kalekî misilman ku Quranê bibihîze. Li ser dengê cîpeke leşkeran ez ji vê xewna xwe ya şêrîn hişyar bûm, min dît ku ez li ber avahiya Belediya Bazîdê me û heykelê Atatürk wekî rastiyeke tehl ketiye rûyê min.

***

Li Ormiyê, Kurdistana Rojhilat, nêzîkî Otêla Lale, li Meydana Wilayetulfeqîh, min heykelê Mîrxanê Yekdest li ser hespekî dît, ew mîrê Biradostî ku li hember artêşa Sefewiyan şer kir, heta şehîd ket li ser sûrên kela Dimdimê. Heykelê wî mezin bû. Şûrek di kalanekî zîv de di destê wî de bû, li Gola Ormiyê dinêrî, dengê du neferan ji artêşa îranî hate min, ew azarî bûn, ez hişyar bûm. Çavê min li heykelê sê leşkerên îranî ket, di meydanê de bilind bû û bayê Ormiye dilewitand.

***

Li Mehabad min dîsa xewneke beravêtî dît, li Meydana Çarçira heykelê pêşewa Qazî Mihemed serê xwe li ezmên dixist, destê xwe yê rastê bilind kiribû û bi çavên tijî hêsir li Daşa Mecîd dinêrî. Xuşxuşa avrêjan bû, bayekî hênik ji hêla Çemê Mehabad dihat û li rûyê min dixist, min kameraya xwe hilda ji bo fotografekî wî heykelê pîroz bikişînim, ew heykel ji ber çavê min heliya, dengê azana mexrîbê ji Mescîd Qazî bilind bû, dîsa xewna min li min herimand. Di nav dû û mija rojavayê re min navê Ellah li ser stûneke qalind ji rengên ala îranê ya nû dît. Bi dilekê şikestî min her çar xewnên xwe li Meydana Çarçira, ji hevalê xwe re gotin, û me bi hev re kesereke dirêj hilanî.

www.arsiv

Zêdebûna zarokan guneh e!

Kefre û Tajdo; gundên girêdayê navçeya Kercewsê ne. Teybetiya vî gundî ku bi sed salan e kurd û suryanî wekî du bira bi hev re dijîn. Ji bilî Mele û Keşe. Sedema vê jî, ku temamê gundiyan diçin ber siya dêrê mele ji ber vê rewşê, gelekî ji gundiyan dixeyide.

Mele rojekê Keşe dibîne û jê re dibêje:

– Ez nizanim mebesta te çi ye, tu gundiyan li cem xwe berhev dikî.

Keşe dibêje:

– Ji gundiyên xwe bipirse.

Keşe li Mele guhdarî nake û diçe mala xwe. Nakokiyên di navbera Keşe û Mele de bi vî awayî berdewam dikin. Rojekê, qeymeqamê Kercewsê gazî temamê meleyên herêmê dike ku, bi wan re civînekê çêbike. Mele giştik li dibistanekê kom dibin. Miftî û qeymeqam dest bi axaftinê dikin.

Qeymeqam dibêje:

– Ey birayên min yên mumîn, ev mijara me hûn jî dizanin pir girîng e ji ber ku, her roj bi dehan zarok li vê herêmê dimirin. Divê her mele, dera ku lê kar dike ji gundiyan re bibêje "Ne ku heta bikaribin bila zarokan çêkin, heta bikaribin wan xwedî bikin, bila zarokan çêbikin." Zêdebûna zaroka guneh e!

Mafê axaftinê dide miftî.

Miftî jî wiha diaxive:

– Birayên min ên alimên misliman, wekî hûn jî dizanin kurd pir ji zarokan hez dikin. Ew malbatên ku zarokên wan pir in, guneh dikin.! Ji ber ku, xizan in, li zarokan mêze nakin, lewre ew kes jî pir gunehkar dibin, ji bo ku tevî birayên me, nekevin gunehan, divê ku hûn di



axaftinên xutbe û nimejanê de gundiyan hişyar bikin.

Civîn bi vî avayî diqede, mele hêrsa xwe dikine dilê xwe û derdikevin. Ji ber ku, meleyên herêmê bi giştî du jinên wan û kerîk zarokên wan hene. Melê gundê Kefrê gopalê xwe dixe destê xwe, hêdî hêdî dikeve riya gund û ji xwe re diaxive: "Du jin û çardeh zarokên min hene, li gorî qeymeqam û miftî min pir guneh kirine. Lê ji vir pê de ezê gunehê xwe zêdetir bikim. Ezê ji gundiyan jî gunehkar bikim û bi taybetî suryaniyan. Lê divê ez bi Kaşo re (Keşe) bibim destebira.

Mele, bi kela germa nîvro re nêzîkî gund dibe. Dêra Suryanî ya li serê gund bû civat û Keşe li ber siya dêrê disekinîne li Mele dinihêrin ku Mele ji Kercewsê bi lezgînî tê gund. Gundî hemû matmayî dimînin, çawa Mele kele–kela nîvro de û bi lezîgînî tê. Mele raste rast berê xwe dide civata ku li ber siya dêrê civiyan e. Tevî gundiyan ji ber Mele radibin piya û xêrhatinê lê dikin. Mele, çavê xwe li cihekî bijun digerîne, diçe li kêleka Keşe rûdine. Gundî careke din matmayî dimînin.

Mele dibêje:

– Ya birayê Kaşo tu çawan î, baş î?

Keşe heyirî dimîne û bersiva mele dide.

– Tu sax bî birayê Seyda, te xêr e, vê kela havînê te daye rê tu hatî.

– Ez ji te re çi bêjim birayê Kaşo, bi İsa û Mihemed ez îro pir aciz bûme.

– Ka bibêje birayê Seyda çima tu aciz bûyî?

– Birayê Kaşo ma qey te di kitêba de dîtiye çêkirina zarokan guneh e.

– Na birayê Seyda zêdebûna zarokan xêr tê nivîsandin.

Mele bi hêrs destê xwe radike li diwarê dêrê dixe.

– Aha bi vê mizgefta mala Xudê, tu rast dibêjî, ez jî wekî te difikirm.

Li ser gotina mala mirovê di civatê de dest bi ken dikin û dibêjin:

– Mele ew ne dîwarê mizgeftê ye, yê dêrê ye.

Mele:

– Ferq nake, ma ew jî ne cihê xêrê ye. Ya birayê Kaşo gerek e tu bêjî suryaniyan û ezê jî bibêjim kurdên misilman, bila xêra bikin. Ji bo ku em herine bihuştê...

GURGÎN TORÎ

BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (69) XAÇEPIRSA

Bersiva Xaçepirsa 67'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 69'an Kaseta Ferhat Tunç "KAYIP" e

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 67'an Pirtûka Osman Aytar Kurdistana bi fifti–fifti qezenc kirine.

Ji ber sedemeke teknîkî me navên kesên ku xelata qezenc kirine ne nivîsî, di hejmara bê de emê binivîsin.

Milletî Rewşen–birek		Robar Kurmancî ya jêrîn		Soz, peyman Bi tikirdiki nav		Keşê ku xwarinê çêdike		Cejn Cînavkeke xweditiyê	Pêşgirek
9		4			3				
Firengî Pelg				10		Nirx, hêjayî Başî		8	
			Sembola Nîkelê		Baş, rind			Rojek	5 Paşgirek
Bajarekî Kurdistan Berevajî girîn		2		Semboleke neçîrvan Xayin	7				Tîpeke kurdî
					Nîvgirandê Yewnanistanê		Hacetê cot Dît		
Paşgirek Cînevkek			Hêvî Cînavkek						
1		Olan, Qertafek				Rojek			
Derveyî (bi kirdikî) Bey							Tîpek		
			Naveki jinan			6			

PEYVA VEŞARÎ

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10

Ji TAYD–DER 'ê Pêşbaziya Helbest û Çîrokan

Komeleya Piştgirî û Hevkariya Malbatên Girtiyan (TAYD–DER) bi mebesta bîranîna şehîdên 14'ê tîrmehê, pêşbaziya helbest û çîrokan li dar dixe. Hate diyarkirin ku, divê berhemên nivîskaran ji 10 rûpelî neborin û her kes divê bi çîrokekê beşdarî pêşbaziyê bibe. Her wiha hat daxuyakirin ku wê beşa helbestan ji 5 helbestan pêk were. Kesên ku bixwazin beşdarî pêşbaziyê bibin divê berhemên xwe herî dereng heta roja 1'ê tîrmehê bişînin vê navnîşanê: *İsmet Kaptan mah. Damak apt. 1369 sk. no:42 Basmane/İzmir.*

Beşdarên pêşbaziyê, berhemên xwe dikarin bi kurdî û tirkî binivîsin. Piştî nirxandina ku wê di dawiya pêşbaziyê de were kirin ji kesê yekemîn re: Seta pirtûkên Mamosta İsmail Beşikçi û abonetiya salekê ya Rojnameya Demokrasiyê;

Ji duyemîn re: Abonetiya salekê ya Rojnameya Azadiya Welat û Kovara Jiyana Rewşenê;

Ji sêyemîn re: Abonetiya salekê a Kovara Özgür Halkê û kasetên ku NÇM'ê derxistine, wê werin diyarîkirin.

Her wiha, çîrok, helbest û bîranînên ku di pêşbaziyê de cih girtibin, wê mîna pirtûk werin wişandin û ji bo alîkariya TAYD–DER'ê wê were firotin.

Li gorî daxuyaniyê, xelatên pêşbaziyê wê şeva 14'ê tîrmehê li NÇM'ya İzmîrê saet li 20.00'an wê werin dayîn.

Kongreya Yekîtiya Mamosteyan

Yekitiya Mamostayên Kurd wê di 31'ê gulana 1997'an de kongreya xwe ya çaremîn saz bike. Kongre, wê li Dortmundê li Navenda Çanda Ehmedê Xanî li saet 12.00'an dest pê bike.

Di daxuyaniya ji bo kongreyê de bal tê kişandin ser girîngiya serdema ku em tê re derbas dibin û wisa tê gotin: "Ev dema ku ji bo gelê Kurdistanê demek e hebûn û tunebûnê ye, ji her kesê kurd dixwaze ku ew bêdeng nemîne û berpirsiya xwe bi cih bîne. Bêguman di vî warî de barê herî giran dikeve ser milên mamostayên kurd."

Di rojeva kongreyê de ev mijar hene: Hilbijartina dîwanê, xwendina rapora salane, pêşkêşkirina kar û xebatên perwerdeyî û zanistî.

Hilbijartina komîteya karger, plansaziya salê...

Ji bo têkilîdanînê jî ev tel-fax hatiye dayîn:

Tel: 0 231–161–377 fax: 0090–212–251 9013...

Li Avcılarê kesek ji aliyê polîsan ve hate kuştin

Roja 22'ê gulanê li Avcılara Stenbolê di navbera polîs û kesekî de şer derketiye di şer de polîsek û kesek bi navê Selahattin Üçkardeş hatine kuştin. Li gorî daxuyaniyên polîsan ew kes berpirsê ERNK'ê yê Marmarayê bûye.

Li gorî agahiyên ku ketine destê me, Selehattin Üçkardeş di sala 1967'an de li Swêregê hatiye dinê. Wî di sala 1989'an de Zanîngeha Marmarayê şaxa teknîkê qedandiye. Di sala 1992'yan de ku kurê-apê wî Ali İhsan Üçkardeş şehîd dikeve ew jî beşdarî refên gerîla dibe.

Me serî dananî li ber tu kesî
Her dem neyar ji me ditirsî
Jîna xwe parast me di çiyan de
Şaxê xwe berdan me di cîhan de
Me pir xwîn rijand ji bo serxwebûn
Yek ji me diket hezar radibûn

Te riya me rast û ronahî kir û beriya 12 salî bi mayînên komara tirk, te em di riya berxwedanê de tenê hiştin. Lê belê têkoşîna te her dem wê rê nîşanî me bide.

M. Emîn SEZGÎN
1943– ....

Malbata wî (Omer Xoce)

Ferhengok

avarê bûn: Ji rê derketin
avahî: xanî (yapı)
awarte: olağandışı, istisnayî
babet: mijar, dabaş (konu)
bîstik: kêlî (kısa an)
çilo: çawa, çito
derfet: imkan
derhêner: yönetmen
dîmen: menzere
dîmenkirin: gerüntüleme
ewlehî: ewlehî (güvenlik)
ezimandin: vexandin, (dawet etmek)
fêrgeh: dibistan
fêz: gurur
gemaro: dorgirtin, ambargo
hêjar: xizan, belengaz, feqîr
heman kat: eynî wextî de
hest: dilîn, (duygu)
jîndarkirin: giyan kirin (canlandırma)
kalan: kın
katjimêr: demjimêr, saet
kend û kosp: astengî (engel)
kendav: körfez
komalkujî: tevkujî (katliam)
nîştecih bûn: bi cih bûn
qelebîsk: çömelme
pelişandin: hilweşandin
pol: sınıf
suxre: xizmet
şane: hücre
şîn: karîn, şiyan yapabilmek)
tîp: harf
tirazokirî: bi wezn, (ölçü)
tore: wêje, edebiyat
watedar: bi mane (anlamlı)
xeternak: bi tehlîke

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. (adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL–FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÛNERÎTIYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Tel: 00 32
53 64 12 62
Brûksel
Suriye:
Jan Dost
Helîm Yûsiv
Berlin:
Silêman Sîdo
49–30–69002695
Hannover:
Selîm Biçûk
49–5721–81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49–871–670884
Stockholm:
Robîn Rewşen
46–8–7510564
Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

www.kurdi.org

Me ev fîlm di nava mercên ne–asayî de çêkir

Ahmet Soner xwestiye bi Serokê Dadgeha Zagona Bingehîn a Tirkiyeyê Yekta Güngör Özden û serokê berê yê Dadgeha Ewlekariya Dewletê Nusret Dermiral re jî li ser Beşikçi biaxive, lê wan jî xwe nedaye ber. Soner diyar dike ku Beşikçi nameyeke pir tûj ji Yekta Güngör Özden re şandiye, bi taybetî xwestiye li ser vê nameyê biaxive û dîtinên wî yên der barê Beşikçi de tevî belgefîlm bike. Lê ev daxwaz ji ber helwesta Özden pêk nehatiye.

Hefteya çûyî li Navenda Çanda Mezopotamya şaxa Stenbolê fîlmekî belgeyî ku jiyana Mamoste İsmail Beşikçi dide nasîn, hate nîşandan. Çêkerê îv belgefîlmî derhêner Ahmet Soner e ku berê jî li NÇM'ê dersên li ser sînemayê didan. Soner bi mebesta ku qet nebe kesên hêja jiyana wan neyê jibîrkirin û her tim bêne bîra mirovan fîlmê belgeyî bi vî rengî dikşîne. Soner fîlmeke belgeyî li ser Yılmız Güney çêkiribû û îcar jî li ser İsmail Beşikçi çêkir. Ligel kêm derfetan û amatorbûna lîstikvanan jî, film gelekî watedar e ji bo kurdan, lê divê mirov li ser kêmasiyên wî jî raweste. Tiştên ku li gorî me kêmasî bûn, me ji derhênerê film Ahmet Soner pirsî, wî jî li ser rewşa ku wan tê de fîlmê belgeyî çêkiriye, agahî dan me.

Pirsa me ya pêşîn ev bû, 'We di rewşeke çawa de ev fîlmê belgeyî kişand û li gorî we çi kêmasiyên wî hene?' Soner berê pêşîn nerehetbûna xwe ya der barê dereng mayîna çêkirîna vî belgefîlmî de anî ziman. Derhêner Soner da xuyakirin ku heke kesekî wekî Beşikçi li welatekî din bûya wê li ser wî sîh–çil fîlmên belgeyî bihatana çêkirin, da ku li wan welatan jiyana qatilan dibe film, lê li Tirkiyeyê nahêlin ku kesekî wekî Beşikçi bê nasîn. Her wiha Ahmet Soner got ku bîst sal bûye ku wî xwestiye fîlmekî belgeyî û bi awayekî pisporî çêbike, ji ber mercên ne– asayî ancax tiştekî bi vî rengî derketiye rastê. Ew jî destnîşan dike ku bi kesên amator û ji ber rewşa aborî tiştê ku wî plan kiriye bi temamî derneketiye holê. Lê ew dixwaze fîlmekî jî li ser Beşikçi çêbike

Ji bo fîlmê belgeyî nêzîkî mîlyarek pere xerc kirine ku ev jî di çêkirina fîlmekî belgeyî de mesrefa herî hindik e. Dîsa pirsa me ya 'ji bo çi we dengê İsmail Beşikçi dublaj kir' jî ev agahî dane me: "Me xwest ku bi temamî fîlmekî belgeyî ku jiyana Beşikçi derxe pêş bikişînin, an jî qet nebe kesekî ku piçekî dengê wî dişibe dengê Beşikçi peyde bikin, çênebû û lewre jî me mecbûr man ku dengê Beşikçi dublaj bikin." Her wiha wî xwestiye ku bi lîstikvanên pispor vî karî bike lê astengiyên ku wê dewlet derxe pêşberî wan û heta belkî ji ber wê yekê nehêlin ew wî fîlmê belgeyî bikşînin jî, ji ber wê serî li wê rêyê jî nexistiye.

Li ser kişîna fîlmê belgeyî û dîmenkirina wî jî pir astengî derketine pêşberî wan ji ber ku li Kurdistanê şer heye, nikaribûne herine Kurdistanê bi piranî li Stenbolê hatine kişandin. Hinek jî ji ber lezgîniyê çêbûye, ji ber ku Komeleya Mafên Mirovan (İHD) di wan rojan de çalakiyeke bi navê "Ji Beşikçi re Azadî" xwestiye çêbike û wî jî xwestiye film bigihe çalakiyê. Vê yekê jî hem ji aliyê dîmenkirinê ve û hem jî ji aliyê lîstikvaniyê ve astengiyên mezin derxistine pêşberî wan.

Her wiha li ser pirsa me ya 'Gelo we mamoste Beşikçi bi temamî da nasîn?' Wî diyar kir ku nikaribûye bi hemû kesên ku Beşikçi nas dikin re bikeve têkiliyê. Yek ji wan kesan Mehdî Zana bûye ku du caran bi alîkariya Mehmet Aktaş li ser Beşikçi pê re axiviye, lê wan ew kaset winda kirine. Yê din jî hevalê Beşikçi yê leşkerî Yılmaz Öztürk bûye ku pê re axiviye lê wî xwe nedaye ber. Li aliyê din Ahmet Soner xwestiye bi Serokê Dadgeha Zagona Bingehîn a Tirkiyeyê Yekta Güngör Özden û serokê berê yê Dadgeha Ewlekariya Dewletê Nusret Dermiral re jî li ser Beşikçi biaxive lê wan jî xwe nedaye ber. Her wiha Soner diyar dike ku Beşikçi nameyeke pir tûj ji Yekta Güngör Özden re şandiye, bi taybetî xwestiye li ser vê nameyê biaxive û dîtinên wî yên der barê Beşikçi de tevî belgefîlm bike.

Ahmet Soner da xuyakirin ku wan xwestiye bi pir kesên ku Beşikçi nas dikin re têkîlî deynin, lê kesên ku Beşikçi nas dikin, derneketine holê, ev jî di film de kêmasiyek e û heke ew kes di rojên pêş de derkevin, wê dîtinên wan jî bistîne û li film zêde bike.

Bi pirsa me ya li ser 'We helwesta temaşevanan çawa dît' re jî ev tişt derketine pêş. Li gorî Soner temaşevanên kurd ji ber ku ji vî karî fêm nakin, nikarin tiştekî jî bibêjin an jî ji wan re pir nû ye. Wî wisa bawer kiriye ku rexne wê jê re bên, lê kesên ku temaşe kirine tevan gotine "baş e". Her wiha wî diyar kir ku kurd dibêjin 'Bila li ser me tişt çêbibin, lê çawa dibin bila bibin' ev mantiq jî li gorî wî wê roj bi roj ji holê rabe. Û li ser vê yekê jî mînaka filmê 'Işıklar Sönmesin' da.

Ahmet Soner dixwaze li ser pir kesan fîlmên belgeyî çêbike, ev jî ji ber tengasiyên aborî çênabin, lê heke her kes li filmê belgeyî yê li ser jiyana Beşikçi temaşe bikin û pera bidin, wê di rojên pêş de jî fîlmên belgeyî li ser kesên mîna Musa Anter û kesên ku vê gavê li jiyanê ne agahiyan berhev bike û bike film.

Soner li ser tewra çapemeniya tirk ku qet tiştek li ser vî filmî nenivîsand jî, dadixuyîne ku îlana belgefîlmê ji aliyê İHD'ê ve hate kirin. Ew wisa bawer dike ku Serkana Giştî ya Artêşa Tirk berî demekê ku ji çapemeniyê xwestiye, çapemenî eleqeyê nîşanî daxuyaniyên İHD'ê nedin.

Me li ser koma sînemayê ya NÇM'ê jî ji mamoste Ahmet Soner pirsî, 'Gelo rewşa wan li gorî we çawa ye.' Li ser vê yekê jî daxuyand ku baweriya wî bi wan heye ku wê di rojên pêş de bi ser bikevin, tiştê girîng ew e ku bingeh bê danîn û îro jî pir kesên navdar li wê derê ders didin, ev jî nîşana pêşketinê ye.

Her wiha film ji aliyê lîstikvaniyê û jîndarkirinê ve hinek qelsiyan di xwe de bihewîne jî, bi giştî baş dixuye. Jixwe Ahmet Soner jî dide xuyakirin ku qet nebe kesên ku li vî filmî temaşe dikin, bila pirtûkên Beşikçi bixwînin. Di filmê belgeyî de dîtinên Yaşar Kaya, Yalçın Küçük, Vedat Türkali, Bilgesu Erenus, Serhat Bucak, Feqî Hüseyin Sağnıç, pîreka Beşikçi û hin kesên din cih girtine. Digel hinek dîmenên ji jiyana Beşikçi, hinek bûyer jî ji nû ve hatine jîndarkirin. Fîlm li Ewrûpayê di destpêka meha adarê de hatiye nîşandan û hin televîzyonên Almanyayê jî eleqe nîşan dane, dibe ku ew jî film nîşan bidin û wê di rojên pêş de ev film di MED–TV'yê de jî bê weşandin.

METİN AKSOY

www.arsiv.org